



Arşevê Oskan

Heta ku em nebin xwedî soz, wê li serê me rabe bahoz



Dema ku mirov li deverekê, ji deverên dunyayê dijî, rojekê, heyvekê, salekê yan deh salan. Divê mirov ji wan war û deveran fêrî tiştan bibe -çi baş, çi xirab- ew mijareke din e. Mebesta min ew e, ku herdu aliyê li hemû civatan peyda dibin. Yek ji wan tiştên qenc, soz e. Li seranserî dunyayê, bi tevayî û li cem Ewropiyên bi taybetî, soz tiştekî pîroz e. Qet nayê qebûl kirin, ku mirov wê di ser guhan re bavêje, yan bînpê bike. Duristiya soz û peymanên wan, ne li ser asta kesayetên bitenê ne. Lê belê, di kar û xebatên wan yê rojane de jî, her lidarî. Ji tirênan bigre heyanî dibistan û nexweşxanan.

Ev hemû li ser asta bajarekî yan welatekî, dikevin ser hev û sistemekê saz dikin. Heger ku soz bê bînpêkirin, ew ê armancine xirab bi xwe re bînin holê. Hêdî hêdî. ew avahî û sistema wî welatî, lihevdxîne û têkve diçe.

Wê bibin mîna welatên rojhilata navîn yan jî yê Misilmanan. Nemûne; ku tirênek deh kêlikan ji soza xwe dereng dikeve, pîlanên bi dehan tirênan xirab dike û li rawistgehan bi sedan kes li hev kom dibin û wî dîmenî pirotesto dikin.

Mebesta ji vê çîrokê, ku Kurdên me yê serbilind, bi dehê salan li van welatan man e, hîna jî fêrî sistemeke wisa nebûn e.

Tê bibêje qey malxiraban do ji Kurdistanê hatine, hîna ti guhertinên erênî pêre çênebûn e. Di nav her tiştî de dijî û bi çavên serê xwe her tiştî dibînin, lê nikarin fêr bibin. Ku sozekê di seet neh de dide, seet yazdeh nû bi ser soza xwe de tê -heger ku hat-ez bawer dikim, ku ev yek li cem piraniya Kurdên me peyda dibe, heger ji sedî neghêje nod û pêncan, bê gumane ku wê bighêje nod û şeşan.

Di destpêka ku ez hatim Almaniya yê, hevalên min her dem û gav dixwestin ku ji bajarê xwe werim

mêvanê wan, dema ku ez ne dihatim, dunya li ser serê min li hevdixistin û gaznê jinbiyekê ji min dikirin. Cara ku ji bajarê xwe bihatima cem wan jî, ew rêvçûn bi seetan dixawar. -Ji bilî şaşiyên ku bi min re çêdibûn, yê bi rêv de-. Ji ber, ku yê bi ziman nizanibe, ne dikare rast bipirse û ne dikare pîlanan rast bixwîne û têbighêje. Em li welatê xwe fêrbûbûn, ku ji serê welat heyanî lingê welat, tirênek bi tenê hebû, ew tirên jî, rojê carekê diçû û dihat. Lê li Ewropayê ne wisa ye keko. Her ji çarîkê carekê, bi dehan tirên dimeş in. hem di navenda bajêr û hem ji bajarekî heyanî yê din, ji bilî ku di gelek cihan de, tirênên xwe diguherin. Heger mirov xwe jibîr bike û ji guhertinek derbas bibe. Çend seetên din, li rêwîtiya mirovî zêdetir dibe.


Di gel van tiştan hemiyan jî, dema ku ez dihatim mêvanê wan hevalên xwe, yê ku xwedê giravî bûne wek Ewropiyên. Ez bi seetan, li banhofan û rawest gehan li bendî wan dimam, min li derdora xwe dinêrî û ji polîsan ditirsyam, ku min bidîtana, ji sedî sed wê min ceza bikrana.

Mirovên panaber, ku rewşa wan wek ya min ba, ne dibû ku ji topraxa bajarê xwe derkevin. Dema ku min di wê bendewariyê de, telefonî wan dikir, hezar mixabînên xwe tanîn ziman û digotin: „Bi şeref ez di xew re çûbûm“. „Mêvanekî min hatibû û ez bi wî mijûl bûbûm“. „Keçek bi min re, li ser telefonê û ez pêre germ bûbûm“. „Havalekî min, li ser misincerê bi min re ketibû gengeşiyê“. Lê ya rast, ne ev hemû bûn, ya rast ew bû, ku em Kurd nikarin bibin xwedî soz, heta ku em nebin xwedî soz, wê li serê me rabe bahoz, emê nikaribin ti pêşveçûnan jî bidestxînin.

Dibe ku di dema sozeke bi netewê ve girêdayî be û tu xwe jibîr bike, tu bibe sedemê kuştina gelek mirovên bê guneh, yan têkveçûna xebata bi dehsalan temen.

Qado Şêrîn

Daxwiyaniya rewşenbîrî



Gelo kurd li rewşenbîran guhdarî dikin? Ji rewşa rojane diyar e ku guhdarî nakin. Gelo şewirmendên serok û rêberên me hene? Di be ku ji ber wê ewqasî partiyên me têkdiçin û li dij hev derdikevin.

Eger tu ne bi me re bî, naxwe tu li dijî me yî! Belkî jî dijmin û xayînî.

Wexta şoreş li dar be, beşdar, piştgir û rewşenbîrên şoreşê dibin mîna şanika mêşa hunguv, her yek ji hêla xwe ve guman dike ku bê wî/wê hunguv çê nabe, hema hema karen ku mîna hev in dikin. Her wiha bîr û bo çûnên rewşenbîran mîna hev in, hemû di berjewendiya şoreşê de ne, her rewşenbîrek bi şeweyekî riya serkeftina şoreşê diafirîne.

Çilo şoreş bê vîn û îradeya gelan bi ser nakeve, her wiha bê ramana rewşenbîriyane dê seqet û bawî be.

Wexta şoreş destpêdike, rewşenbîr texmîn dike ku ew ê ta dawiyê zindî nemîne û bi serkeftinan şa nebe, êdî rêbaz û daxwiyaniya şoreşê di rojên pêşî de amade dike.

Şoreş ji bo baş û nebaşan, ji bo guhertinên mezî û xweşkirina jiyana gel radibe. Di şoreşê de beşdar û rewşenbîr dikarin bîrên kuştin, lê gel dimîne. Gel jî tu caran bê rewşenbîr namînin daku wî birêve bibin.

Ew ne rewşenbîr e ew ê li derveyî şoreşê bijî, û ji bo azadiya xwe bîheng bimîne, her wiha ramana wî divê azad û bêlayane be.

Rewşenbîr şoreşê tapo dike, nav tê dide, deng û pênuşa şoreşê ye, belkî jî giyanê wê ye.

Li dawî, bi serkeftina şoreşê re, çilo şoreşger dice nav zarokên xwe û jiyana xwe ya rojane dijî. Rewşenbîr jî piştî her tiştî radestî rêberên gel dike, dibe ku ew rêber siyasetmedarên gel bin, pênuşekê hiltîne yekê datîne û tenê naveroka nivîsên wî tîr guhertin.

Li Sûriyeyê bi giştî û li Roj avayê Kurdistanê bi taybetî şoreşek rabû û hîn jî berdewam e, rewşa kurdan gelekî aloz û bipirsgirêke, çimkî partî nikarin li hev bikin.

Rewşenbîrên partiyên jî bêtir ji afirandina çareseriyên pesnê Partiya

xwe didin, her wiha lib rewşenbîrên serbixwe û êla ya ne nayê guhdarî kirin. Êdî bi dîtina me çareserî ev e:

- 01- Yekkirina helwest û gotara siyasî.
- 02- Pirsgirêka Rojava li Rojava çareser dibe.
- 03- Pêwîste Pyd têkçûna xwe di birêvebirina herêma kurdî de ragihîne, piştî gelek bûyer û şaşiyên.

04- Ji bo aramiya herêmê, divê pyd ji gelê kurd lêborîne bixwaze, li ser hemû komkujî, şaşî û kiryarên ku Pyd û Ypg û asayîşên wê pê rabûne.

Lêborîn hêz e, û dê aramiyê bîne herêmê.

05- Li darxistina kongireyek giştî ji hemû aliyên siyasî, civakî, rewşenbîrî.

06- kongir dikare mîna parleman be yan jî bibe parleman, endamên kongir jî dikarin bibin endamên parleman. Nav jî dibe Parlemanê Rojavayê Kurdistanê, taku rêjîm birûxe û hîlbijartinên demuqrat çê bibin.

07- Kongir dikare komîteke birêvebir (istiratîcî) damezirîne, ew komît dikare komîta danîna pêşniyar, piroje û siyasetan be.

08- Komîta Istratîcî dikare birêvebirina herêmê bike

09- Komîtên birêvebir bîr damezirandin, wek komîta karê derve, dadgeh, komîta leşkerî, civakî, samanî, çandî.

10- Damezirandina artêşek giştî bêlayane, her wisa dameziran dina asayîşan. Komîta istiratîcî dikare bangî gel bike û şanikên taybet dikarin bi kar û barên rêxistinî rabin.

11- Piştî kongir û dameziran dina komîtan, nabe partî nûnertiya berjewendiyên giştî yê gelê kurd bikin.

12- Kar û xebat tê kirin ji bo peyda kirina etmosfera piştî rûxandina rêjîmê.

Bi texmîna me, eger hat û wisa bû, wê gelê kurd li rojava bibe yek û dê tenê dijîtiya rêjîma dictator bike, taku birûxe. Her wiha hêz û bi dest xistina mafan di yekîtiya me deye û em hemû di ber de berpirsyar in, bi taybetî partiyên siyasî.

Alan pîr Mem

Kundê şerê birakujiyê
li ser dara bihara erebî dîke lûbe lub

ne ji şer revyane û ne tiştek ,qey biçek birçî bûn û kêr karî heye, lê tiştek ji gotnên wan zigurd û xêzanan rast tine bû, "em ji ber şer revyane û malên me wêran bûn" û ji van gotnên qelewî giş derew.

başê ..ev yak û ev asteya yekeme ji lîstoka wanî mezin ,û em nizanin bê wê di pêşerojê de çi çêbibe berî em lîstokê bi ewkekî giştî têbighên.

û ew xortên kurdê sûrî yê ko hatine ji xwe ne cî ..ne war ji wan re heye ..yê kar û îş dît dît û yê karek jî ji xwe re nedît wê bi kude hereya wê li bin wa konka razê û serê sibeha wê here wê xarçya ko her deqê bîst kes jê derdikevin û bîst dikevênê û kûçkaniye.

û ya jî wê li şeqam û kolanan razê ,îca kîjanê baştîre ..ne îş ne kar û di wê demê de jî rê ji duhokê heta hewlêr û silêmanyê girtî bû ,îca wê ev reben çibke ..vegere sûrî wê wî bikşînin leşkeryê û li vir jî bimêne kûçkanya birra ye ..îca li vê navê hukmeta herêm bang xoratandîkir....werin bibin pêşmerge ji alîkî de nav û şan û serbilindiye û ji alîkî dînde emê we ji vê pîstyê rizgar bikin , werin xwarin û vexwarna we li ser meye û razaneke xweş di kerevana de jî ji were heye û di ser wilo giştî re jî emê pera bi wedin ,her yek dora 300..400..500 dolarî wê di mehê de bistîne ,û bi vî hawî xort bi sseda..bi hezara kişandin pêşmergeyê û dane wan û dane wan heta di devê wan re avêt.

ev jimarên mezin ji xortên leşker,yên ko fêr bûn rahiştina çek û çilo tang û topan rêveber bikin ..amade bûn û ro bi ro jimarên wan bilindtir dibû ,lê pirsyara herî mezin li vê navê ji ber çi û ji çire....?? wê ev leşker û ev girûpên leşkerî dakevin sûrî....şar û bajarên kurda ji qamişlo bigir hetanî bi efrîn û kobanê di bin destê xwe xin û giş ji bo çipere û petrol û kiştûkala herêmênî pîr dewlemend û zengîn ...di bin siya serokatîya berzanîni law.

lê kengî "apoçî" dihêlin ev tişt bi serî bibe û xwîna wan xortên pêşmerge jî ji xwe germe û bi hestekî netewî ...partî hatine şer û "apoçî" jî ji xwe berê ttor bûne ji wan ,û dîtna wan bi mirna wane.

de ana em vegerin dîroka kurdîni reş di not û şeşa de ..."mesûdê berzanî" xwe avêt "ssedam hisên" destê alîkaryê jê xwest û bi hev re partî û ssedam şerê "celal telebanî" kirin û ew ji hewlêr û her derê bi tang û topan derxistin ,eve şerê birakujiyê ...kurd kurda bikujin ...kurd xwe bavêje dijminê xwe de birê xwenî kurd bikuje..

wê wilo li sûrî jî çêbibe ...wê "apoçî" bang hevalê xwe kin ji rejîma sûrî ya ko her tişt li herêma kurdî daye dest wan .. û rastya vê berçav bû(kî here amûdê û qamişlo wê li ser vê xweşik raweste) giftûgo jêre navê û wê wan bîne ser xortê qamişlo û amûdê û dêrik û efrîn û kobanê"pêşmergeên rojava".

Kî tê û dibêje kes nîzane bê wê sibe çi bibe û wê çi çê bibe ji ber ko di do de tiştek tine bû bêje..belkî di pêşeroja nêzik de wilo bibe û wilo mebe ,û bi wateyeke din ,ti agahî û danîn tine ne ko riya rastyê bide ber mere.

îro ro li rojavayê kurdistanê. kê ev nav li ber dilê xwe xweş û şêrîn dît, yan nedî, ev ne pîrsgirêka milletê kurde ,ev pîrsgirêka şofînyetê ye.

tiştin gelek giring û balkêş çêdibin ,û bandora wan zindiye li ser jiyana kurdî di herêmê de,bi ewkekî giştî "apoçî" û hevalêt xwe û bi leşker û girûp û milîşiyatê xwe ji PKK û PYD û YPG herêma kurdî zefî kirne û penca xwenî leşkerî lê asê kirne.

jiyana wênî abûrî di dest wan deye ,jiyana wênî rewşenbîrî di dest wan deye û jiyana wênî siyasî jî di dest wan deye ,qîma kê bê ..neyê ev ne xefet û

xeme ji wanre ,her tişt di bin destê xwede hiştine dîl û ti nav û nîşanê nadin partiyan û li wan dinerin wekû ko li nebûnekê û komekê ji ne tiştîkî temaşe dikin.

eve bercewendî, eve rastî îro ro û vî tiştî ji xwede dikine maf û ew bi wilo razî ne.

kêfa kê bê ...neyê ev ne tiştekî zêde dîke û ne kêr dîke .

giş dibê rejîma sûrî û hostê wanî siyasî "beşar esed" ev daye wan û agahî ji wan re tîni ji şamê...ji arvaza serokatîyê hazir û amade li ser masê meznên wan di malê gel de..têne danîn.

îca taqîkirina rastiya vê ne barê meye ana û ne di derbarê babeta medeye.

"apoçî" û "artêşa sûrîni azad" li hev nakin çiqasî li serêkanyê pevketin û şer û ceng di navbera wan de xwîn di holê de rîz kir û çiqeysî li parêzgeha helebê de li tarê kurdan(şêx meqsûd û eşrefyê) rastî hev hatin û rrepanî hev ,çi kuştî ,çi hiştî ,çi birîndar mal û avahî wêran bûn ,û yê çû jî ji welatiya wekû ko dibêjin û ev peyv tim ji ber guhê me nakeve , "yê çû ji kîs xwe çû".

û li aliyekî din me go hêza herî xurt îro ro li rojava "apoçîne" lê gelo ka li başûrê kurdistanê çi çêdibe û hukmeta herêm û serokatîya berzanî ji çire amade dîke û "apoçî" û "artêşa azad" û "rejîma esed" û "turkya erdoxanî" û "îraqa malîkî" çilo lê dinerin...?? û li kur rawestyane ji van hazirya û li bende çine...? berî her tiştî hukmeta herêmê kurdistanê tiştekî gelekî mezin dîke û wê lîskekê mezin bilîze ,lê armanc û mebest jê çiyê....?? riya sînor li ber xelkê cezîra sûrî vekir û hişt ko jimarên gelek..gelek mezin ji xort û zigurd û xêzanan bêne kurdistanê li bin navê "penaberyê" û şandin dî rêkixirawên mirovatî û bi taybet û ya herî navdar (UN) de li halê vê xelkê binerîn ,çawa aware bûn û şerpeze bûn ji ber pîrsa ko li sûrî dibe anha. û rabûn bi deh hezaran xelk tomar kirin li ser bîngehekê ko ev ji welatê xwe revyane û li vê de .. di qada herêm de penaberin ,û ew bi xwe û ji xwe du hêz jî li ser qadekê nabe û bi taybet wê çilo du hêzên xurt ko ji berê de li hev nakin û ne li hev dikin ,wê bibin hevbeşê herêmekê û kengî tirk qebûl dikin ji ber ko "receb tteyîb erdoxan" xweş dizane ko kurdistan li sûrî bête ragihandin û di bin siya hukmeta herêmê kurdistanê û PKK ê de ,ev ji xwe dema herdû li hev bîni û li hev bikin,wê kurdê tirkî jî serê wî bi êşînin û wê rabin şoreşê û wê pîrsgirêkên pîr mezin çêbibin.

ev li alîkî û "rejîma sûrî" kengî qîma wê tî ko serokatîya berzanî li kurdistanê îraqê tîkeve sûrî û bi çi rengî ,bi rengê leşkerî ,ê ev di tarîxa jî de çênabe.



û civata nêwdewletî û emêrika ka wê çilo li vê babetê binerîn û erebên netewîni...şofîni û malîkî ji alîkî dînde û dost û hevalbendên rejîma sûrî ji rûsya û îran û çînê .

mane divê mere van gişa deyne ber çavê xwe ji ber ko lîstok jî bi ewka vî gewdî mezine û ji xwe li vê navê her çil partiyên menî li sûrî yê ko ro bi ro dizên û ji pevçûnên wanî siyasîni bi derewa partiyek nih çêdibe bi berdeyamî ne li ber tiştekîne û giş jî destê serokatîya berzanî maç dikin.

û ji xwe berê oposisyona sûrî ne li ber tiştekî ye bi hazirya "siûdyê û tirkî û emêrika û qeter". îca maye bê van tevan jî ..her yek çi ji pêşeroja siyaseta xwe re daniye.

û ji xwe berê oposisyona sûrî ne li ber tiştekî ye bi hazirya "siûdyê û tirkî û emêrika û qeter". îca maye bê van tevan jî ..her yek çi ji pêşeroja siyaseta xwe re daniye.

Weşanên Nû



Can Kurd

kurdistanicom@yahoo.de

Tîravêjan

We em xapandin



Rojek derbas nabe, ku nûçeyeke nebaş ji herêmen Rojavayê Kurdistanê, di malperên Internetê de belav nebe. Van nûçeyên ku bi nivîskî an bi telefonê ji me re tên û em vîdoyên wan jî hinde caran dibînin, û em li ser rastîniya jêderên wan radiwestin, dibêjin ku her roj lêdan û kuştin û revandina mirovan li welêt çêdibin. Van hêriş ne ji aliyê leşkerê rejîma Esed ve, ne jî ji aliyê sopyayê sûrî yê azad ve û ne jî ji aliyê komikên îslamî yên ereb ve pêda dibin, van karên nebaş, ku bi ser gelê me de tên, ji aliyê partiyekî Kurdan ve, ku bi navê „Partiya yekîtiya Demokrat“e, li qelemê dikevin.

Li herêma Kurdxê davêjine ser rêveçûneke jinan, ku bi terzekî aştîyane jin û keçên Kurd derketibûn li pêş seraya hukumdariya bajêrê Efrînê, ji bo aştîyê, mafên mirov û ji bo xwestina xwarin û av û cereyanê, bi ser ve jî bo xortkirina hevkarîya di nav hêzên neteweyî yên gelê me de. PYD avêt ser wan jin û keç û zarokan, bi lêdan û porkişandin û bi dijûnên nebaş ewana ji ser hev belav kirin û hinek ji wan girtin, dan ber jêpirsînê. Yek ji wan dota şehîdekî Kurd e, ku bi navê wî Hennan Dîko bû, û ji malbateke navdar bû. Ji wan jinan re gotin, ka ji bo çi ewana li hember „Cebhetul Nusre“ an li hember „Sopyayê Sûrî yê Azad“ dernakevin, tevî ku wan herdu hêz li derveyî „Kurdîstana Azadkirî!!“ ne, û berpirsiyariya navçeya ku tê de rêveçûn çêbûye, wekî dixuye, di destê PYD de ye.

Li Rojavayê Kurdistanê bi behaniya derewîn a firotina „Heşîşê“, pîr mirov hatin kuştin û li gelek navçeyan bi şeweyekî hovane, wekî li (Til Xezalê), li herêma Kobaniyê, avêtin ser malên Kurdan û xûn rijandin, tevî ku firoşkarên Heşîşê li gor zagona Sûrî nayin kuştin, ewana tên girtin û wan davêjin zindanan. PYD ta niha ne xudan zagoneke fermî ye, ku wilo xûna xelkê, her roj birijîne û behaneyên wilo erzan pêda bike, bo hukumdariya xwe bigudîne.

Ma qey hemî kesên, ku PYD ta niha kuştine, û bi taybet wan kadroyên tevgera neteweyî ya kurdî, giş Heşîşfiroş bûn?

Paş ku şandiyeye Encumena Neteweyî ya Kurdî çû Istanbolê û bi hêz û kesaniyên hembervaniya Sûrî re, di van rojên dawî de, kete gengeşiyê li ser tevlêbûna wê di xebata hembervaniya neteweyî ya Sûrî de û xwe amadekirina bo kongireya Genfê 2, Asayîş û Masayîşên (PYD) avêtin ser xebatkarên wan partiyên li gelek deran û bi taybet li bajêrê Amûde, ku yek ji navendên serhildanê gelê me ye, berê û niha jî.

Ev PYD bi xwe PKK ye li Rojava Kurdistanê, tevî ku ew hez dike, xwe wekî partiyekî serbixwe bide nasîn, lê gelê me baş dizane, ku evana „Apocî“ yên berê ne, yên ku ji me re û ji her kurdekî nişperwer re, digotin „ew ê ji Kurdîstaneke serbixwe re nexebite, xiniz e, bê rûmet e, bê şeref e û xayîn e“, û îro ji gelê me re dixwazin siyaseta xwe ya nermokî wekî siyaseteke diristir bidin pejirandin û dîsa dibêjin, ku ewê ne li gel wan be, hevalê neyar e, noker e û xayîn e, tevî ku bi xwe nema tiştekî ji gelê Kurd re dixwazin, heta di navê partiya wan de jî ne Kurd û ne Kurdistan heye, û di bernameya wan de jî ne serxwebûn, ne federalî û ne jî autonomî ji Rojavayê Kurdistanê re heye. Hukumdariya wan jî di bin gumanê de ye, ji ber ku balafirên Esed di ser baregehên wan re difirin û diçin li baregehên hinek hinek dî didin.

Ta niha li hinde ciyan, wekî li Nubbul û Alzahra, ku xelkê wan Şihe ne, PYD aşkere aligê (aligirê) leşkerê Esed bû. Di navbera wê û sopyayê sûrî yê azad de gelek caran pevçûn pêda bû. Ma qey Nubbul û Al zahra ji Rojavayê Kurdistanê ne, da PKK xelkê wan ji Sopyayê Azad biparize? PKK gelê me dike û dibêje:“Ez we diparêzim!“ Ma gelê me ji kê diparize ? Qey ji serhildana gelê Sûrî diparize ne ji leşkerê Esed ?


Fermana bilind a vê komikê Apociyan, wekî komikên dî yên li Rojhilat û Başûr û Bakurê Kurdistanê jî, ku di bin navin wilo yên bê Kurdîni pêda kirine, ji serokatiya PKK, ji çiyayê Qendilê ve tê. Iro, bê ku carekê jî ev komika Apociyan bavêje ser qîşleyeke leşkerê dewletê an jî aliyekî naskirî ji dewletên cîhanê piştvanîya wê bike, bûye xudana deselatê di Rojavayê Kurdistanê de. Ev çawa dibe, ku hêzek welatekî bê ceng û cîdal bistîne? Gelek çek û debanên giran li ser trombêlên bi çar têvedankan ketine destên PYD, ji ku ve kes nizane . Pirrepirra hêzên wan e, li teviya Rojavayê Kurdistanê „checkpoint“ên sopyayekî bi hezaran keç û kurên Kurdan di nav de pêda kirine, heta keçikên 12 û 13 salî jî ji xwe re kirine „Grilla“ û „Asayîş“, ji dibistan û berdestiya dayîk û bavan derxistine, û bi wan davêjin ser baregehên partî û komeleyên Kurdan, ku ji wan jî hene bi vê PYD re ketine nav hevbendiyekê, ku di saya serok Masûd Barzanî de bi navê „Desteya Kurdî ya Bilind“ hatibû avakirin, û ji ber karên nebaş ên PYD, Encumena Neteweyî ya kurdî, ku têde gelek partiyên me yên dermokrat hene, gihaye pileya destkişanê ji hevkarîya di nav wê desteyê de.

Ta niha êşa ku gelê me yê Kurd ji ber hêrişên Apociyan dibîne, destpêka derketina PKK li bakurê Kurdistanê tîne bîra me. Hîngê hemî hêzên gelê me li başûr, li rojava û li rojhilat piştvanîya PKK kirin, bi hîviya ku gelê me yê birîndar û pîrlêdayî li bakur ji nû ve ji razanga mirinêhilbe, lê pişt re hemî wan hêzên neteweyî li xwe hişyar bûn û pêhoşin, ku PKK wan tew napejirîne, xwe wekî şûngirê wan tevan dibîne û bizava xwe dike, wan gişan ji ortê rake, wan ji qada xebatê sîl bike, wan teva bike. Ev sînyarî vê carê li Rojavayê Kurdistanê tê lîskandin . Pîrrianiya gelê me vê yekê wekî xapandineke mezin dibîne, ji ber ku gelê me deriyên malên xwe, sîn û dilên xwe bo her reviyekî PKK, di rojên teng û tarî de vekir, wan xortên, ku tî û birçî di sînoran re hatibûn wekî zarokên xwe xudî kirin, û bi ser ve jî gelek piştvanîya PKK ji her aliyekî ve bi xortanî kir, da kanibe sala 1984ê dest bi şorişê bike. Jin û bûkan zêrên xwe ji ber û sîngên xwe dikirin, bazing û gustîlkên xwe davêtin ber lingêd „Serokê Serokan!“ Ewê vê yekê bavêje paş guhan wê kûr bibe, û ewê wa piştvanîya mezin, bi xûn û bi zêr û bi her tiştekî berhemdar, ji bîr bike, mirovekî kême û bi kêşeya Kurdistanê re ne dirist e.

Iro tiştê PKK bi navê PYD an bi behaneyê cîbecîhkirina hêminiyê di Rojavayê Kurdistanê de dike, ji zorbazî û sîtemkariya rêjîma faşist a partiya Baas wêrantir e. Ev zoradriya malbata Esed bi xwe ye.

Hîviya min ew e, ku giş roşenbîrên Kurdistanê, part û rêkxirawên wê li hember dîktatoriya PKK di Rojavayê Kurdistanê de bédeng nebin.

Weşanên Nû




HALÎN

Nivîskar: Rosan LEZGÎN

Otobusa beledîya Berê Koyî ra kewtibî rayîr û ding ra ding hîna vêşer bîyîni pîrrî. Guzergahê aye Ofîse , Koşuyolu û semtê Hepîsxaneyî ra fetilîyaynî, şîyîni Seyrantepe û wetê ey.

Wexto ke resa bi Ofîse heme koltuxî debîy û êdî korîdor zî raywanan ra bîyîni pîrrî . Mîyanê raywanê ke payanî ra vindertibî de yew kênaya davîsterra, ya sey yew mankene bi porê xo yê dergê keji bal antîni xo ser. Kêneke zaf rindeke bî. Beşna xo ya bêqusûre mîyanê tişortêko sipî û pantolê bilûcîne keweyî de ca ra pakêt kerdibî . Destikê yew koltuxe de girewtibî û tam orteyê otubuse de sey yew sitûna mermerêne bî.



SÎNOR

XURŞÎD MÎRZENGÎ

“Roj hatibû heta ji bihurîbû . Di nava ezman de wek biyokeye sebole bi dara ezmanîn ve aliqandî . Tirêjên zêrîn mîna xinceran didan çaraliyê beriyê . Bi tîna xwe,marên şeşmeh razayî ji xewa kûr şiyar dikir,giyan didan beriyê Kulîlk û nêrgiz radibûn ser piyan. Çayirê hûrik û qicik, nêrgiza yekta, nefela gulnedayî û gûrizê cejna biharê pîroz dikir.Wawikê devê çeman û kewên gozel li beriyê di tedvîr û tedarikên hêkkirinê de.

Ji dengê banga meleyan, perdeyên guhan diçirriyan . Meleyên Qamişlû û Nisêbinê azana nivro didan . Ji kovikên minareyan tewir tewir sewt, celep celep deng derdiketin . Yekî hîn nû dest pê kiribû: ‘Allahû Ekber’ yekî din: ‘Heyalel felaaa’ ên din teştêkî din digot. Ew deng ji kovikên minareyan derdiketin û tevlêhev dibûn, guh kerr dikirin”

Ebdulbaqî Huseynî

Ji ferhenga jînen Kurd (xeleka 4)

DURIYE EWNÎ

Rojnamevan û nivîskar



Di hevpeyvîneke xwe de ligel rojnameyeke fransawî, Duriye Ewnî wiha dibêje; Ku kalkê wê Ebdulqadir Ewnî ê ku li bajarê Siwêrekê (Kurdîstana bakur) muftî bû, kurê xwe Muhamed Elî Ewnî ji tîrsa girtinê, ew şand welatê Misirê, dûrî çavên leşkerên Osmanîyan. Bavê wê li wir xwendina xwe a herî bilind kir û li cem Melek Farûq weke wergervan di Qesra Abdîn karkir, û giringtirîn babet pê radibû, ku hemî reşbelekên û belgeyên mabata Muhamed Elî Paşa wergerîne zimanê erebî û wan di pirtûkxaneyê de biparêze.

Wekû tê nasîn ku M.Elî Ewnî pirtûka herî giranbuha û balkêş linik kurdan ji zimanê farisî wergerandiye zimanê erebî, a ku binavê "Şerefname" ye, ku xudanê wê Şerefxanê Bedlîsî bû. M.Elî Ewnî ligel hevalê xwe Yihya Alxaşab pêşgotineke pir bedew û dewlemend ji Şerefnameyê re nivîsandibûn.

Duriye Ewnî, ji bavekî kurd e (Muhamed Elî Ewnî) û ji dayikekê erebî- Misirîye (Zeyneb Muhamed Rifa'î).

Duriye li Misirê ji dayik bûye, û li wir mezinbûye, xwendina xwe li Qahîra û li Parîsê qedandiye, ewê bi sedê gotaran bi erebî û fransawî nivîsandiye, babetên wê herdem li ser gelên bindest bû, û bi taybetî gelê kurd, ku xwe herdem nêzikî vî miletî didît, ji ber xwîneke kurdî di rihên wê de dilivîya...

Ewê di hemî wanran de li ser kêşa kurdî radiwestiya û berxwedan di ber de dikir,...

Duriye gelek çarçûnê Kurdîstanê da ku rewşa kurdan ji nêzik ve bibîne . Di şoreşa seydayî Berzanî de li dij rêjîma Bexdê, ew bibû peyamnêra şoreşê bo fransawîyan. Wêneyeke Duriye ligel Mele Mustefa Berzanî heye,...

Ew çûye Kurdîstana bakur jî (Turkiyê), da ku rewşa kurdên bakur jî di navbeyna 1980 û 1990î de.

Duriye gelekî li ser mesela peywendiyên dinavbera kurd û ereban de hizirkiriyê, û nerînên xwe ên nêzik û dûr dane xuyanîkirin, û dibîne ku di pêşerojê de herêma Rojhilata Navîn wê bêavakirin bi hinera kurd û ereb pêkve. Û dibêje, ku pêdiviya kurd bi ereban re heye wekû pêdiviya ereban bi kurdan ve heye. Nimûneyekê tîne ku serkaniya herdu çeman Dicle û Ferat ji Kurdîstana bakur e .

Duriye derbarî nivîsandinên xwe wiha dibêje; " Ez van pirtûkan ji nerîneke mirovatî dinivîsînim, ligel ku koka min ji alî diya min ve erebe û li ser xelkên

Kînanê tême hesêb, lê rehên min, xwîneke kurdî jî di wan re diherike, û min gelek ji kultura fransawîyan jî hilgirtiyê, dema ez li ser keviyên çemê Sînê mezindibûme û rastîya sipî naskiriyê".

Ewê destpêka xwendina xwe li Firansa di xwendegaha Aborî û siyasetê debû , paş re xwendina wergerandinê xwend, û bû rojnamevan.

Duriye 27 salan weke rojnamevan li Firansa karkiriyê, û li wir bûye seroka hevbanda rojnamevanên firansîyan .

Ewê bi gelek mirovên navdar li cîhanê hevpeyvîn kirine, û çûye cihên herî giring da ku nûçeyên bidestxîne . Wek nimûne; şerê dinavbera Iraq û Iranê .

Berhemên Duriye Ewnî; sê pirtûkin: naverokan wan pirtûkan li ser peywendiyên di navbera kurd û reban ji alîkî ve, û Kurd û Misirîyan ji alîkî din ve, radiweste. Herwiha gelekî li ser rewşa kurdan li her çar perçên Kurdîstanê berbîfirehî diaxive,... li vir ezê hinekî li ser naveroka her pirtûkekê rawestim û xalên sereke ji xwendevanan re berbiçav bikim.

1. Pirtûka yekê: Erebi û Kurd, nelihevî an lihevî



Duriye, ev pirtûk diyarî sê kesan kiriyê û wiha nivîsandiye:

- Bo Bavê min Muhamed Elî Ewnî, ewê yekem bû ku kurd bi ereban dane nasîn,...

- Bo Diya min Zeyneb, a ku piştewaniya bavê min kir, ligel ku Misirîbû.

- Bo mamostê min Ehmed Behaedîn, ku ew mirovê yekem bû, ku min dehf da nivîsandinê.

Naveroka pirtûkê ji 11 dergehên ve hatiye avakirin, û di 230 rûpelî de hatiye himbêz kirin.

Dergehê yekê: Bingeha kurd; kurd kîne, ji kû hatine, coxrafiya Kurdîstanê, zimanê kurdî, ola wan,... li vir Duriye dibêje, ku kurd berî 3000 sal li ser xaka xwe bûn.

Dergehê didwan: Peywendiyên kurd û ereban ji dema musilmantiyê ta bi dawiya Imperatoriya Osmanî (1918z).

Dergehê sisyan: Herifandina Imperatoriya Osmanî û damezirandina Turkiya a nûjen.

Dergehê çaran: Pêkanîna dewleta Iraqê (1920z). Petrol çarenûsiya Kurdîstanê diçespîne.

Dergehê pêncan: Peywendiyên kurd û ereb ji dema rizgarkirina Iraqê ta bi şerê tankavê (Xelîc), 1920-1991.

Dergehê şeşan: Rewşa kurdan li Turkiyê.

Dergehê heftan: Rewşa kurdan li Iraqê.

Dergehê heştan: Rewşa kurdan li Sûriyê. Duriye dibêje ku rewşa kurdan li van hersî dewletan (Turkiyê, Iraq û Sûriyê) piştî sala 1991 gelekî hate guhertin, û kêşa kurdî gelek çaran, di Rojhilata Navîn de, a yekem bû.

Dergehê nehan: Rewşa kurdan li Libnanê û li Yekîtiya Sovyêt (a berê).

Dergehê dehan: Pewwendiyên kurd û ereban û nerîna ereban derbarî tevgerên kurdî ên rizgarî.

Dergehê yazdehan: Nerînek pêşerojî, sînyaroyên berbiçav. Li vir Duriye gelek nerîne xweyî cudan dide, ku pêşeroja kurdan çawa bê, coxrafiya siyasî wê bighê çî qûnaxê, aboriya kurdan bi çî rengî be, civaka Kurdîstanê wê bighê çî pelpelûkê.

Pirtûka Duriye Ewnî (Ereb û Kurd, nelihevî an lihevî) hêjayî xwendinê ye, ji ber ku naveroka wê, dewlemende bi zanyariyên li ser kurdan. Pirtûk ji jêderên giranbuha tê hesêb.

2. Pirtûka didwan: kurd (Alakrad)



Duriye ev pirtûk bo gelê kurd ê ku tîkoşînekê bo nasnameyê û azadiyê dike, diyarkiriyê. Pirtûk bi pêşgotineke dirêj, derbarî kurd û siyaseta ku di heqê kurdan de têkirin, ji alî Duriye hatiye nivîsandin.

Naveroka pirtûkê ji van beşan têhev:

Beşê yekê: Kurd, koka wan, jêderên xuristî li Kurdîstanê, ola wan, ziman û çand. Di vî warî de Duriye hebûna çiyayên kurdîstanê û şûna wan li ser kurdan bi du aliyên şirovedike û dibêje: Aliyê baş (postîv) ku van çiyayan hiştiye ku kurd bi nasnameya xwe ve bêne girêdan, ziman û adetên xwe biparêzin, û di hemî çerxan de xwe winda neke. Aliyê nebaş (negatîv) ku kurd dûrî şarîstaniyê ketibû.

Beşê didwan: Giringtirîn hikûmetên kurdî di dema Islamê de; 1. Imperatoriya kurdî wek (Mîdya, Mîtanî û Kotîl). Û ji xwe mîrneşîmên û komarên kurdî di dema musilmantiyê de evbûn: Rawadiye, Salariye, Hisnûiye (Hemezhan), Dostiye û Merwaniye, Erdelaniye, Xerestanyê, Berxuiyê li Biloxîstanê.

Beşê sisyan: ji van xalan tê hev;

1. Koka turkan, dîroka biçûbûna wan li Anadolê.
2. Kurd û turkên Selçoqî.

3. Imperatoriya Osmanî, destpêk û dawî.

4. Damezrandina Turkiya nûjen .

Beşê çaran: Turkiya û kêşa kurdî. Li vir Duriye çend xalên konkirêt tîne ziman û li ser rewşa PKK gelekî radiweste: weke şoreşa partiya karkerên Kurdistanê, telefizyona wan (Med TV), perlenama wan ku li dervî welat saz kiribûn, Ebdula Ocelan, bingeha wî, fikrê wî, kerktera wî, û li dawî girtina wî.

Duriye dibêje ku ewê çend caran ligel Ocelan dîtin û hevpeyvîn kirine, û wesfê wî bi vî rengî dide: "Ocelan mirovekî fedyoke, herdû çavên wîyî reş tîrêjên wek Lêzerê jê tîne, herwiha simbêlên wî ku zêdî nivê riwê wî girtiye, wan tîrêjan bi hêzîr dîke".

Beşê pêncan: Damezrandina dewleta Iraqê. Dîsa Duriye dibêje ku; Petrol çarenûsiya Kurdistanê serrastdike . Di vî beşî de, hevalbûna dinavbera kurd û Ingilîzan dide xuyanî, û li ser peymanê Sîfir (1920) gelekî radiweste.

Beşê şeşan: Kurd di Iraqê de. Dîroka kurdan li Iraqê bi van xalan dide diyarkirin: 1. Pêşveçûna tevgera netewî a kurdî 2. Peywendiya ligel Abdulkêrim Qasim. 3. Şerê çekdarî li dijî hikûmeta Bexdê 4. Herêma Kurdistanê. 5. Şerê birakujî.

Beşê heftan: Rewşa kurdan li Iranê, dîroka wan, Şoreşên wan (Şoreşa Simko, 1920 û komara Mahabad 1946), Şahê Iranê û Kurd, kurd û şerê dinavbera Irak û Iranê (1980-1988).

Beşê heyştan: Rewşa kurdan li Sûriya û Libnanê, dîroka wan, pêşketina peywendiyê di navbera rejîma Sûriyê û kurdan. Dîroka kurdên Libnanê .


Beşê nehan: Kurd li Soviyata berê, hebûna wan, belavkirina wan li komarên Soviyetê, herifandina yekîtiya Soviyet.

Beşê dehan: Peywendiyên kurd û ereban. Di vî beşî de peywendiya kurdan bi ereban re bi gelemperî û bi taybetî berbiçav kiriye . Weke;

1. Peywendiya cîhana erebî bi tevgerên kurdî re.
2. Nerîna rewşenbîrên ereb derbarî kurdan ve.
3. Komcivîna erebî û kêşa kurdî.
4. Peywendiyên kurd bi dewleta Cezair re.
5. Peywendiyên kurd bi dewleta Lîbya re.
6. Peywendiyên kurdan bi xelkên Fîlestînî re.
7. Peywendiyên kurdan bi xelkên Misrî re.

Beşê yazdan: Nerîneke pêşerojî bo kurdan li her çar perçên Kurdistanê, û sînyaroyên berbiçav!

3. Pirtûka sisyan (Kurd li Misir ji demên bûrî ta ana)



Ev pirtûk ji alî sê mirovan hatiye amedekirin û nivîsandin ku ew jî evin:

Duriye Ewnî: rojnamevana navdar ku 27 salan di rojnameyên fransawiya de karkiriye, û gelekî guhdan daye rewşa kurdan li herçar aliyên Kurdistanê.

Mahmûd Zayid: professorê tarîxê û pispor di warê kurdî de, li zanîngeha AlAzhar, bajarê AlQara.

Mustefa Muhamed Ewad, mamosteye di tarîx û şaristaniya Islamî de li zanîngeha AlAzhar.

Çapa yekê ji pirtûkê di sala 2011an de, li Qahîrê baytexta Misrê hate der .

Naveroka pirtûkê ligel pêşgotin û paşgotin û diyarî ji heft beşan tê hev:

1. Peywendiyên kurd û misirîyan di dema Feriuniyan de.
2. Kurd li Misirê berî dewleta Eyobîyan.
3. Kurd li Misirê di serdema Eyobîyan de.
4. Kurd li Misirê di serdema Memlokiyan de.
5. Kurd li Misirê ji dema Osmaniyan ta dema Muhamed Elî Paşa û malbata wî.

6. Navdar û zanyarên misirî ku bi koka xwe kurdin, di dema nûjen de.

Di vî beşî de, rola kurdan di çand û derhênana misirî de dide xuyanîkirin û navên wan mezinan dide diyarkirin; weke: Muhamed Ebdê, Qasim Emîn, Ebas Mahmûd Elaqaq, Ehmed Şewqî, Ayişe Altaymorîye, Mahmûd Teymûr, Şêx Ebdulbasit M. Ebdulsemmed, Lêkolînyan Hesên Zaza, hunermend Sûad Hisnî, derhêner Ehmed Bedîrxan û kurê wî Elî,....td.

7. Serdana kurdên li Misirê. Hersî daneran çûne serdana wan kesên ku di koka xwe de kurdin, li Qahîra û herêma Sa'îd û Dêlta, bê çawa hemîyan digotin, erê em misirînin, lê kalkên me kurdin û ji sedê salan li Misirê bi cî bûne.



Danûstandina min bi Duriye Ewnî re:

Danûstandina min bi rojnamevan û nivîskara kurd Duriye Ewnî vedgere berî 14 salan, dema ku ev name jê re dişandin û gelek caran bi telefonê jî ligel wê diaxivim. Di wê demê de pismamê min Şêxmûs Mele Hesên, di zangoya Qahîre de (phd, doctor degree) amededikr û bibû heval bi Duriye re, ewî gelek zanyarî derbarî wê, ji min re şandin û pirtûka wê a yekem (Ereb û Kurd) bo min hinart.



BI XATIRÊ ÇEKAN

Ernest Hemingway

Werger: Azad Avcı



Ev pirtûka "Bi Xatirê Çekan- (A Farewell to Arms)" di sala 1929 de tê çapkirin . Ernest Hemingway bûyerên di nav şertên şerê yekemîn a dinê de ku li ser wî derbazbûne û rû bi rû jiyaye, di vî pirtûkê de pisporîtiya xwe di warê wêjeyê de bi hewlekî gelek hêja nivîsiye . Çîroka xweş ê vî serboriyê, bê guman peydabûna evîndariyek bê hempa ye, ku li pişt eniya şer di navbera hemşîrek û serbazek de qewimiye.

Ev roman di warê wêjeyê de ji ber vebêj û vegotina pisporî di qata herî bilind a wêjeyê de wek hêjayê xelatê hatiye dîtin: Ev serborî ya ji eniya şer hevpeyda kirina dilnê evîndariyek bê hempa ye, ji destpêkê heya dawiyê leyîskek nazenîn e.

WEŞANXANA KOMAL:

KOMAL / ÇAPKIRIN-WEŞANDIN-BELAVKIRIN

Tekîlî û navnîşan:

Komal Bas. Yay. Dağ. Ltd. Şti.

Katip Mustafa Çelebi Mah .Hasnun Galip Sk.

Uğur apt . No: 25 K.2 D.4 Beyoğlu / İST.

Tlf: 0090 - 0212 243 83 97

Fax: 0090 - 0212 244 24 83

Stenbol: komalyayinevi@hotmail.com

Ewropa: vesanxanakomal@yahoo.de

Para zanyarên Alman di reşkirina Êzdiyan de



Dr. jur. Celalettin Kartal/* Zanyar ew in yên kar û xebata zanistiyê ji dil dikin; bi kar û xebatên xwe zanistiyê pêdixin. Nexwe ew zanistê hem bi berhemên xwe û hem jî bi şîretên xwe pêş ve dibin. Erkên wan e ku bi "çavekî bêalî" xebatên xwe bimeşînin. Divê di berhemên wan de zanîn hebe, lê ne reşkirin. Ji xwe dema ew li ser kêmjimaran rawestin, divê ew hîn bêtir têkevin nava hewildanên jidil. Lê wextê hinek ji wan li ser Êzdiyan radiwestin, erkên xwe yên zanistî ji bîr dikin.

Ezê li jêr behsa hinek mirovên 'zane' yên alman bikim ku di bin navê zanistê de çi li ser Êzdiyan nivîsîne. Gernot Wießner di nava Êzdiyan de ji sala 1974ê ve tê naskirin. Tê zanîn ku wî nivîsareke balkêş li ser dîrok û ola Êzdiyan nivîsiye. Gotar di pirtûka Robin Schneider de, piştî jî di malpereke Êzdiyan de hatiye weşandin. Ez li vir hinek ji tezên (nerînên) wî pêşkêşî xwendevanan dikim:

1. "Nikare bê gotin ku Êzdî tev Kurd in" (rp. 31);
2. "Li gor baweriya Êzdiyan, rojekê Îsa wê were û têkeve cihê Tawîsî Melek" (rp. 45);
3. "Ola Êzdiyan jî wek ya Dûrziyan oleke bi dizî ye" (rp. 42);
4. "Navê Xwedê li bal Êzdiyan tine ye" (rp. 42); 5. "Ji toreyên olî yên Êzdiyan ti zanista xwedênasî nikare bê afirandin" (rp. 40).

Ma Wießner nizanibû ku di nav kevneşopên Êzdiyan de "ilmê xwedênasîyê" pirr e? Eger ola Êzdiyan oleke bi dizî ye, ma çima rêbazên wan hene û cejnên xwe eşkere pîroz dikin? Nizanibû ku ola Êzdiyan ne oleke veşartî ye? Ma olên veşartî hene? Ursula Spuler - Stegemann di sala 1995ê de gotarek weşandiye. Wê tezên xwe derbarên Êzdiyan de wiha nivîsîne:

1. "Bi pirranî kevneşopên Êzdiyan bi erebî ne" (rp. 3);
2. "Êzdî li ser miriyên xwe şîne nakin" (rp. 6);
3. "Rengê şîne li bal Êzdiyan rengê şîne ye" (rp. 8).

Supler-Stegemann nizane ku Êzdî jî li ser miriyên xwe şîne dikin? Xuya ye ev olas ne pîspora Êzdayetiyê ye. Ew jî wek hemû pîsporên alman bi kurdî nizane.

Wek tê zanîn Andreas Ackermann yek ji şîretvanê Şewirdariya Êzdiyan li Almanyayê ye. Wî di gotareke xwe de nêrîna xwe li ser Êzdiyan wiha nivîsiye:

"Toreyê dijberiya xwendinê bûye sedemê wê yekê ku ola Êzdiyan wek oleke dizî hatiye naskirin" (rp. 10). Di gotareke din de jî wiha nivîsiye: "Çand (kultur) nayê windakirin" (rp. 67-69), tenê tê guhertin.

Ackermann dibêje ku wî qaşo ev yek ji Christine Allison hilgirtiye.

Lê di pirtûka Allison de xuya ye ku wê ev yek weke Ackermann nenivîsiye. Pêwîste di vir de bê zanin ku Ackermann pîsporekî "gelnas" e. Ew dizane ku ola Êzdiyan oleke "yekgelî" ye.

Kevneşopên wê bi kurdî ne. Dema zimanê kurdî ji bîr bikin, wê nasname xwe ya netewî û ya olî jî winda bikin.

Ina Wunn di gotareke xwe de behsa çînen Êzdiyan yên civakî dike, lê nabêje ku çînen civaka Êzdiyan teqez ne wek yên hindî ne. Ew di heman gotarê de dibêje ku civaka êzdî li Almanyayê jiyaneke cihê dijî. Lê ew nabêje ku Êzdî di kargehên Almanyayê de bi karkerên alman re dixebitin; zarokên wan beşdarî dibistanên almanî dibin; tîkiliyên wan bi Almanan re pîralî ne; danûstanî bi karmendên alman re dikin; gellek ciwanên êzdî îro jî Almanan bêhtir bi almanî dizanin. Bi vê rêyê nasname xwe ya olî û netewî yekser xistine metirsiyeke mezin.

Ma zimanê almanî nebûye sedema helandina (bişaftin) wan?

Encam

Ma çima zanyarên alman Êzdiyan reş dikin? Ya girîngtir ma çima Christine Allison (Îngîlîz), Philip G. Kreyenbroek (Holendî) yan jî John S. Guest (Amerîkî) Êzdiyan reş nakin, lê çima tenê zanyarên alman "dûv û dûçikan" bi wan ve dikin? Îro heta hinek lêkolerên Tirkiyeyê hemdem jî Êzdiyan wek zanyarên alman reş nakin. Ma sedemên ku lêkolerên alman Êzdiyan reş dikin yan jî derbarên wan de nêrînen ne rast dinivîsin û belav dikin çi ne? Ma çima Allison û Kreyenbroek bi kurdî dizanin, lê çima yên alman bi kurdî nizanin? Mamosteyên alman yên ku zarokên Kurdên êzdî di dibistanan de perwerde dikin bi van pêşdarazan bawer nakin? Ma ew bi van nerastiyan serên zarokên Êzdiyan tijî nakin? Ma çima gellek zarokên êzdî îro bûne dijberên qewmê xwe? Ma lêkolerên alman pêşdarazên xwe ne "bi zanîn" li ser Êzdiyan belav dikin? Ma dema ew dibêjin **Xerabîyêra**

i bal Êzdiyan navê Xwedê tine ye, kevneşopên wan bê xwedênasî ne, dîroka wan di tariyê de ye, ew jî li benda Îsayê Xaçparêzan in (Wießner), ma ew ne dibêjin bila Êzdî bihelin û li ser koka xwe şîne nebin? Ma ev pîrs ne hêjayî bersivdanê ne?

* Dr. jur. Celalettin Kartal
Pîspore qanûna navnetewî, kêmjimar û yê olnasiyê

....

Têbînî: Em gotara li jêr mîna bersiva zanyarên Elman diweşînin, ku ew jî gotara Dr. jur. Celalettin Kartal e (Pênûsa Nû).

"ÊZDIYÊN LI ALMANYA DEMA WÛNDABÛNA RÊ Û RÊBAZÊN XWE DIJÎN" /

Dr. jur. Celalettin Kartal

Nirxandina li ser pirtûka bi navê "Philip G. Kreyenbroek, Yezidism in Europe, Different Generations Speak about their Religion, Wiesbaden 2009, In Collaboration wiht Z. Kartal, Kh. Omarkhali, and Kh. Jindy Rashow"

I. Berhemên li ser ola Kurdên Êzdî

Di van 15-20 salên dawî de gelek pirtûk li ser Êzdiyan û Êzdayetiyê tên weşandin. Di nava wan de hinek pirtûk û gotar li ser qewl û "jandilên" Êzdiyan (Dêwrêş, Kreyenbroek, Ezdaname I, Omerxalî & Xankî), li ser zargotin û kevneşopên wan (Allison, Tolan), li ser ol, civak (Kızıllan), dîrok (Açıkyıldız) û qewlên wan (Kreyenbroek), li ser rewş û metirsiya windakirina nasnameya wan li Almanyayê (Kartal) hatine weşandin.

Hinek ji lêkolînvanan xeyrî Êzdî ne (Kreyenbroek, Düchting, Guest, Ackermann) û hinek Kurdin. Lê divê bê gotin, ku zanist derbarê ola Êzdiyan de pirr pêşve neketiye. Hinek gotar û pirtûk li ser "fonksiyon" û rola Tawîsî Melek (Othman) û Şêx Adî (Issa) hatine nivîsîn. Hinek bi tevlihevî li ser nasname, civak û rewşa wan (Kızıllan) hatine weşandin. Lê dema mirov wan dixwîne, eyan e, ev berhem an tevlihevî ne (Ezdaname I, Dewrêş, Kızıllan, Dinayî) an jî tenê pîrsekê vedikolin (Othman: Tawîsî Melek / Issa: Şêx Adî), an jî girîng in, lê ne beş in (Kartal: Pêşeroja Êzdiyên Almanya), an jî di warê metod de bi kêmasî ne (Akbaş).

Hima di vir de divê ez bêjim ku derbarên Êzdiyan de hinek pirtûkên hêja (Açıkyıldız) û hêjagir (Kreyenbroek, Guest, Spät) jî hatine weşandin. Lê tiştê balkêş ew e, ku nivîskarên êzdî ji bilî çend "gotarên tenik" heta îro pirtûkên mayînde nexistine xizmeta zanistê. Helbet gelek sedemên vê yekê hene. Dîsan divê ez destnîşan bikim, ku li ser Kurdên êzdî û ola wan hinek pîrsên girîng hene ku hêjane jidil û bi zanyarî bîr vekolandin: Gelo bi rastî "rêbazên ola Êzdiyan" çi ne? Hima di vir de êzdînas dikarin rê û rêbazên Êzdayetiyê yeko-yeko berhevî rêbazên Qur'anê yan jî "hadîsê Hz.

Mihemed Pêxember" (sunî) bikin. Mesele, gelo Êzdiyekî "her pênc ferzên heqîqetê" neyîne cih, Êzdî ye? Bi ya min wê di berhemeke wiha de kifş bibe ku rê û rêbazên Êzdiyan yên wek "rêbazên teqez" pirr kêmin. Eger rêbazên teqez yên "oleke yek xwedayî" (monoteîstîk) û "yeknetewî" (kurd) pirr kêmin, ma gelo ew civak dikare bi çi awayî li derveyî welat xwe herdem biparêze? Di berhemeke wiha de cûdahiya nava Îslam (pîrnetewî) û Êzdayetiyê (yeknetewî) jî wê baş zelal bibe? Ji xwe pîsporên jîr dikarin pîrsên din jî di berhemeke wiha de vekolin. Mesele, ma gelo kîjan qewl beriya dema Şêx Adî hebûn û çima?

Em werin ser pirtûka Kreyenbroek. Birêz Kreyenbroek pîsporekî êzdînas e. Wek tê gotin bi kurdî dizane. Wî ji bilî gotaran, hinek pirtûkên girîng li ser Êzdiyan weşandine (1995, 2005). Pirtûkên wî ji bilî yekê tev li ser dîrok, civak û tekstên Êzdiyan (qewl, jandil, beyt) hatine nivîsin.

Pirtûka wî ya dawî di sala 2009 de hatiye weşandin. Par û keda sê kesên Kurdên êzdî di vê pirtûkê de heye. Du kes ji wan hem zanyarên êzdînas in û hem jî "dûnavên êzdî" ne (ilimdar). Yek ji wan li Kurdistanê ji dayîk bûye (Rashow), ya din li Ermenîstanê ji dayîk bûye (Omerxalî) û ya sisêya li Almanyayê ji dayîk bûye (Kartal).

II. Naveroka Pirtûkê

Ev pirtûk bi tevayî 246 rûpel e. Pirtûk bi taybetî ser du beşên sereke parvedibe. Di herdu beşên sereke de hem hevpeyvîn û hem şîrove hene. Ev hevpeyvîn tev li ser Êzdiyên li welat (rp. 49-100) û li ser Êzdiyên li derveyî welat, yên li Ermenistan û Rûsyayê ji dayîk bûne hatine nivîsin (109-206). Ji bilî van herdu beşan reşbelekê jî li ser danasîna (introduction) Êzdayetiyê ye (17-48).

Di beşê danasînê de gelek agahî derbarê tore, ol, diha, zewac, cejn, tiştên qedexê û pîroz yên

Êzdayetiye de hene. Ji bilî vê, di vî beşî de hinek agahî jî derbarê dîrok (mejû), cihê jinê di nava civak û ola Êzdiyan de û li ser Êzdiyên Sovyeta berê hene.

Wekî din, di herdu beşên sereke de hevpeyvîn li ser civaka êzdî û rê û rêbazên wê wek rêzdarî, şerm û eyb, namûs, tolhildan, pevçun, rêya çareserkina pevçunê, "hev revandina mêr û jinê", jin revandin, eşirtî, çinên sereke, rewş û merhela zanîna Êzdiyan derbarê ola wan de hene. Di pirtûkê de agahiyên derbarê Êzdiyên li derveyî welat dijîn, wek li Almanya û Ermenîstanê cih digrin, lê berevajî gotina nivîskar di vî pirtûkê de hevpeyvînan bi Êzdiyên Gurcistanê re (rp. 13) tunin. Dîsan agahî derbarê Êzdî û Êzdayetiya Kurdistanê parvekirî û ya azad de berdest in. Di nava van agahiyan de hevpeyvîn li ser "perwerdeya ola Êzdiyan", tore, çand, "pakijî", rêzdarî, tolhildan, zewac, jin û mêr, qelen, çinên sereke, jîna Êzdiyan li diyaspora, cûdahiya nava çand û jîna civaka êzdiyan li welat û derveyî welat (diyaspora), bisk, morkirina zarokan, zewac, şîn, rojî, hec, nanê miriyan, nîrxên pîroz, guneh, siberoja civaka êzdî ya li diyaspora hene. Di dawiya pirtûkê de ji-hevderxistineke (analîz) kurt li ser rewşa Êzdiyên hemdem heye (rp. 227-233). Di dawiya dawî de hemû navên di pirtûkê de derbas dibin, ligel cihên wan di rûpelan de, hatine berhev kirin (rp. 237-246).

III. Ev pirtûk hem bi naveroka xwe ve û hem bi beşê nasîne ve ji bo hemû Kurdan, kesên hewesdar û pisporan girînge.

Di nav hev de 121 hevpeyvîn di vî pirtûkê de hatine bi kar anîn (rp. 12). Ev hevpeyvîn li du beşên Kurdistanê parvekirî (Tirkîyê, Sûriyê) tevî Kurdistanê azad (Îrak) û Ermenîstanê hatine pêkanîn. Dîsa, wek Kreyenbroek di heman rûpelê de destnîşan kiriye, ev 121 hevpeyvîn tenê ne bes in ji bo ji hemû Êzdiyan re bibe berhemeke nîspet (statistically representative). Wek hatiye nivîsîn, ev hevpeyvîn tev li gor "pîrsiyameyekê" (list of questions) hatine meşandin. Ango di pîrsan de bi zêdeyî "metoda non-directive" (metoda pîrsên ne yekser) hatiye bi kar anîn.

Lê di vir de divê ez behsa çend kêmasiyên van hevpeyvînan bikim: Di pirtûkê de kêmasiyên destnîşankirina cihê hevpeyvînan jî kifş in (binêr li rûp. 229-230, behsa TFMi24 di rûp. 108 de dike). Lê kêmasiyên mezin yê metodîk in. Mesele, hem pîrsên "rewa" û hem pîrsên "qedexa" di vî pirtûkê de hene. Gelek pîrsên hatine kirin ne "rewa" ne (maqul), lê di nava wan de pîrsên "spekulativ" (ango bi texmîn) û "suggestiv" hene (binêr li rûp. 132, 134, 157, 160, 162, 165, 167, 184). Lê dibe ev pîrs bi "lezgînî" yan jî bi "kelecânî" hatibin kirin. Ji xwe di gelek pîrsan de kifş e ku hinek pîrs bi rengê "îfadekirinê", lê ne bi rengê hevpeyvînan in. Herwiha di hinek pîrsan de pêşdarazî jî dertên holê.

IV. "Jê keto pê keto"

Ma Êzdî dikarin çiqas dersan ji vî pirtûkê derxînin? Di vî pirtûkê de xweş diyar e ku Êzdiyên Almaniyayê dema windabûna xwe bi lezginî dijîn (rûp. 124, 126, 219-220). Gelek zarokên wan yê li Almaniyayê mezin

dibin, anjî ji dayîkê dibin, ji civaka Êzdiyan re, rê û rêbazên wê re dibin "dijber" (rûp. 173-175, 215, 231).

Ma gelo para pergala perwerdekirina eyaletên Almaniyayê di vî yekê de tune?

Gelo çima zarokên Êzdiyan dêbavên xwe piçuk dibînin (rûp. 125, 230)?

Çima zarokên Êzdiyan xwe "zane" û dêbavên xwe "nezan" dihesibînin (rûp. 125, 230)? Di dibistanên eyaletên Almaniyayê de mamosteyên civaka serdest ji zarokên Êzdiyan re derbarê civak û ola wan de çî dibêjin? Gelo îro di kîjan dibistanên eyaletên Almaniyayê de dersên ola Êzdiyan hene? Ma çima Almanya li gelek eyaletan ji hinek komên koçberan re hertişt ji bo dersdana ola wan amade û organize kiriye, lê çima heman tişt ji bo Kurdên êzdî jî nake? Divê neyê jibîr kirin ku bi giştî her sê, yan jî her heft salên pêşin, ji bo tesîrkirina ser zarok pir girîng in. Eger dêbav di van salan de şîreta li wan nekin, ew zarok ya rêya xwe şaş dikin, anjî dikevin bin bandora civaka serdest. Lê di vî pirtûkê de kifş e ku bi giştî Êzdî zarokên xwe li Almaniyayê perwerde nakin (rûp. 161). Ji bilî vê, zanîna wan derbarê ola wan de, ango rê û rêbazên wan de, yan tune, yan jî pîr kê m e. Ma gelo kîjan serokên komeleyên Êzdiyan, yan jî ronakbîrên wan, wê bikaribin li ser naveroka vî pirtûkê gotûbêj û guftûgoyan di nava Êzdiyên Almaniyayê de di civînan de "bê tirs" bimeşînin? Gelo kîjan komele û serkomeleyên êzdî wê li ser naveroka vî pirtûkê civînan lidarbixe û dêbavên êzdî li gor naveroka vî pirtûkê agahdar û şiyar bike?

Bi ya min tiştê girîng ev e, ku beşekî Êzdiyên akademisyen ku li Almaniyayê mezin bûye, yan jî ji dayîk bûye, bûye "asteng" an jî "dijberê" civaka xwe (rûp. 230). Wekî din di vî pirtûkê de diyar e, ku zarokên tenê bi zimanê almanî baş dizanin û difikirin, nêrîn û nîrxên civaka serdest yekser diparêzin. Hima di vir de divê bê pîrsîn, gelo civakeke serdest ku koçberan û zarokên wan bi rêya pergala xwe li ber hev "çavreş" bike, çiqas amade ye ku koçberan bi erênî întegre bike? Gelo civakeke serdest ku hinek koçberan biparêze û yê din di warê perwerdehiya olê de bêmaf bihêle, çiqas dikare "civakeke pirreng" (pluralism) ava bike? Gelo bi vî yekê civaka serdest mafê wekhevîyê, ango makzagona xwe bin pê nake? Ma gelo çima eyaletên alman heta vêga mafê dersên olî nedaye Êzdiyan, lê daye komên din? Sedema vî yekê tunebûna lobiyeke Êzdiyan e? Gelo sedema vî yekê perçebûna komele û sazîyên Êzdiyan e? Ma ne mafê Êzdiyan e ku di diyasporayê de civaka xwe li gor tore û ola xwe biparêzin?

Jixwe ji zû ve têt gotin ku Êzdiyên li Almaniyayê û bi taybetî nivîsê li Almaniyayê ji dayîk bûye, yan jî mezin bûye, têt "helandin". Lê tiştê balkêş ev e, ne tenê gelek zarokên êzdî û akademisyenên wan têt asîmîlekirin û ji civaka xwe dûr dikevin, wisa jî dibin "dijberê" civaka xwe (rûp. 172-175). Nexwê divê Êzdî jî vî rastîyê dersan derxînin û sazgehên xwe (hêlîn, dibistan, akademiyeke teolojî, weqf) bi dilovanî damezrînin.

Dr. jur. Celalettin Kartal Pîsporê koçberî, kêmetewî û mafên mirovan

Kamiran Alî Bedirxan



Kamiran Alî Bedirxan parêzger û rojnamenivîsê kurd û yek ji lawên malbata mezin a kurdan malbata Bedirxaniyan bû.

Kamiran Alî Bedirxan birayê Celadet û Sureyya bû. Di 21'ê tebaxa 1895'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Wî li Almaniyayê doktoraya xwe ya hiqûqê da. Paşê li Bêyrûtê bi

cih bû û li wir avûkatî kir. Ji bilî ko gelek nivîs û wergerên wî di kovara Hawarê de hatine weşandin, wî di sala 1943'an de li Bêyrûtê rojnameyên Roja Nû û Stêr derxistin.

Kamiran Bedirxan di sala 1947'an de çû Fransayê û li wir sazgeha lêkolînerî ya kurdî ava kir. Di wan deman de jî li Unîversîteya Parîsê dest bi hînkirina zimanê kurdî kir.

Wî di mijarên cihê de, bi zimanên cihê zêdeyî sih kitêbî nivîsandin. Herçiqas kitêbên wî ên kurteçîrokan tunebin jî, wî kurteçîrok jî nivîsandine.

Kamiran Bedirxanê ko hemû jiyana xwe dabû kultur, ziman û edebiyata kurdî, di sala 1978'an de li Parîsê wefat kir.



Kamiran, Sureyya û Celadet Bedir-Xan

Kamiran Alî Bedir-Xan di salên 1940 de, dersên xwendina Kurdî dida Kurdên Lubnanê li zanîngeha (Layîk) ya bi nav û deng, tevî beşdarbûnên wî di weşînan bernameyên Kurdî yê radyowa Rohelatê li Beyrûta Libnanê, ya ku hatibû damezrandin roja 5ê Adarê sala 1941ê. Weşîna radyoyê her hefte 2 caran bû, roja Çarşembê û roja Înê. Kamiran çend pirtûkên xwe jî çap kiribû li çapxane ya Jozêf (Joseph) Selîm Seyqelî li taxa Sokak Al-Bulat.

Kamiran Alî Bedirxan serek da Kurdistanê Başûr sala 1970, û cihê xweşhatinê bû ji aliyê serok Mistefa Barzanî û her kesên ko beşdar bibûn di konfransa 8'an de ya PDK. Gotara wî ya hêja di konfransê de, hêviya Kurdistanê serbdixwe xiste dilê giştîya guhdêran.

Kamiran Alî Bedirxan sala 1971'ê serek da Kurdên Beyrûta Lubnanê. Di vî seredanê de jî, li gel wezîrê kar û barên navxweyî yê Libnanê, Kemal Jumblat (yê ko ew bixwe kurd e) civiya. Bi hinera Kamiran, Jumblat partiyeke Kurdî ramiyarî bi awayekî fermî pijirand, û destûra xebata ramiyarî da Kurdên Lubnanê.

Berhem

Langue kurde, Paris, 1953.

Rêzimana Zimanê Kurdî, Paris, 1971.

Türkçe İzahli Kürtçe Gramer, 1977/1986.

Zimanê Kurd / Kürt Dili, İstanbul (bi Şivan, S.).

Proverbes Kurdes, Paris, 1936 (bi Lucie Paul-Marguerite).

Kolay Kürtçe - Pirtûka ders, Weşanên Doz.

Xwendina Kurdî Pirtûkxana Hawarê Hejmar 10 çapxana Tereqî Şam 1938.


Dersên Şerîetê Pirtûkxana Hawarê Hejmar 12 çapxana Tereqî Şam 1938.

Jêder: Wikîpediya kurdî

DI ÇEND RÛPELAN DE

(kurtejiyan û dem)

Ciwanê Abdal(arşîva tîrêj.net)



Ey hevalê minî rind

Çi li bajêr, çi li gund

Xewna te ya pir giran

Ji bo laşê te derman

Çi xewneke rast û xewş

Dilê te pê maye geş ...

* * *

Wê xweşxwanan bixwênî

Çavê dijmin derênî

Ew xwendin û zanebûn

Nîzik dîkin serxwebûn

Xortên wek te pir zana

Gerek bêjin nezana

Bere destên hev bigrin

Di vê rêkê de bimrin .

Belê .. her wiha jî helbestvanê gewre Cegerxwîn evan gotinên nazik dibêje û bersiva Nayifê Heso dide, yê dawî bi çoşek mezin tê nasîn li nav gelê xwe bi navê : Seydayê TÎRÊJ .. Ew xwediyê gava çeleng, ku di rîya helbest û torevaniya Kurdî de avêtiye ..

Di derbarê helbesta Kurdî de, di vê dema dawî de, bi zaravê Kurmancî dest pê kir, bi du navdarên gewre: Yek jê Seydayê Cegerxwîn bû û yê din jî Seydayê Tîrêj bû .. Bi rengê klasîkî, berê xwe dişopîne û di derbarê vê yekê de, carekê wisan bi vê wateyê dibêje : (Ez li helbestê bi rist, awaz, rêzband û li naveroka wê dinêrim... Ev her çar tişt wê dîkin helbest)

kurtehelbestekê davêje ser mebesta xwe û dibêje:

Ma rûmeta şîrê çi ye?

Ne d' xizmeta mîlet de bî

Ronahiya şîrê çiyê?

Pesnê welat ku tê d' nebî

çibkim ji wê şîrê rişt

Danegire sewdan û mejî

Derdê dil û can nakuşt,

Çaxê ku cewher têd'nebî .

Ji vê yekê xuyaye ku Seydayê Tîrêj, rengê helbesta hîlbijartiyê ji şeweyê kilasîk e.. Tev bi êş û azarên millet û welat girêda ye, û nexasim yekî welatparêz be, ku karibe hest û daxwaz û hêvîyan, wiha bi cih û war bike, bi zimanekî pak û rind, û bi raman û dilekî paqij ...

* * *

Hilbestvanê Kurdî gewre Seydayê Tîrêj, li gundê Nicim ê nêzikî bajarê Qamişloka rengîn , ji hêla rojava navbera wê û bajarê Amûdê ve, yanî li ser rîya navbera herdiwa de, ya ku 10 k.m roavayî dorî Qamişlokê ye, ber sînorê Sûrî-Turkî hatiye dinê û ji dayik bûye, li Kurdistana beşê Sûriya, di sala 1923 an de..

Bi navê duristî: Nayifê Heso ye.. kurê Biro, ji êla û eşîra Bobilana ye.. Lê bi navê Kurdî şêrîn li nav gel hatiye nasîn bi navê: Tîrêj, û ji ber hezkirina gel jêre, dibêjinê mamosta Tîrêj, an seydayê Tîrêj .. û bi rastî wî jî tîrêja xwe avêtiye dil û mejiyê gelê xwe .

Ji malbatek cotkar e .. ji maleke gundî û hejar e, ango bê erd û emlak e, û bi xwe jî biçûkê birayê xwe bû, herwiha di jiyana temenê şeş-salî de, ji gundê Nicim koçdikin û diçin gundê Sêmitika, û gava ku li wir bi cih û war dibin dere ber Melle,-wek heyamê berê- li ber destê Mellê gund (Ibrahîmê Golî) xwendina olî-Quranê û çend pirtûkên olî û tiştin din dixwîne , heyani sala 1937ê.

piştî Melle hin şanê zîrekî tê de dibîne û bi temîna Mellê xwe, diçe bajarê Amûdê û xwendina mektebê Fermî dixwîne, ta bi rêza pêncan ..an ta sala 1943ê. û li ber destê wan mamosteyên gewre, yê wê demê, wek : Qedrî Can, Hemze Beg, û Meksîyê di wê demê de; berpisyarê Mearif (goçela perwerde kirinê) bû li welatê Sûriyê, çaxê dagirkirina Firinsa li welatê Sûriyê.. û bi xwe Meksî yekî girîngtirîn bû di şoreşa Pêx Seîdê Pîran de, di sala 1925 ê li derdora bajarê Amedê.

Û li wê navbera zanistî, pir tişt naskir, pir navdarên mîletê Kurd naskirin, ew welatparêzên çak û ronakbîrê demê, mîna: çegerxwîn, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrî Can û Mellayên Kurd û pirrin dî .. Bi rastî li wir, ruh û hestê welatparêzî li cem bi xurtî afirî û çêbû.. û di bin akama wan navdarên de jî, evîna helbest nivîsê li nik wî şax veda, ku da bi tor û wêjê dikaribe rolek mezin bilîze, di nav tevgera mîletê xwe de .

Lê xuya ye ku, Seydayê Tîrêj bi şeweyê Cegerxwîn hatiye girêdan, piraniya dema xwe pêre dibûrand, ta ku tevî (Koma Ciwanên Kurd) bûye, di rojên xweyî pêşîn de, çaxa damezirandina wê de, lê mixabin .. Piştî heyvekê hate pişafîn, bi şerpola Turkan li dagirîya welêt Sûriyê: destgirta Firinsa ..

* * *

Bi rastî wan dema çarika pêşîn li papelîska bîstan û gava şerê Imperetoran dest pêkir, nexasim şerê cihanê yê pêşîn, li nav ewan dewletên dagirkeran? piştî serketina hinan û daketina hinan, pir tiştên nû li

darketin, yek jê hin dewlet çêbûn, ku berî hingê ne li ser nexşa cihanê bûn, û hin wek gelê Kurdan milletekî bindest ma .

Lê mexabin çerxa felek.. milletê Kurd xwe dît dûtî parên ji serpehatî yê vê buyera mezin ve, tew nexasim milletê Kurd xwe dît parkirî çar perçe, li nav çar millet û nejadan.

Ev yek ji hêlekê û ya din jî ew bû ku di bin akama şoreşa oktober ya sosyalist, li qada Sovyatê gava ku li darket, sala 1917an de, her wiha jî, ramanin nû daketin nav milletan bi rengê serxwebûn û xoybûn, bi navê pêşketinê û wekhevîyê, ji ber pir dixî ketibû navbera Beg û Axa û yê bi wan re mîna şêx û mella ji hêlekê , û navbera hejar û belengazan mîna, cotakar û karkiran ji hêleke din ve .. lewra gelê Kurd dest bi xebat û tevgera xwe kir ji ber xwe ve.. û her wiha, em naxawiz pir duv-dirêj bikin ji ber ev ne mebesta meye .

Di bin akama van raman û buyeran de, Seydayê Tîrêj bêçar ma karê bidizî bike, û di sala 1938 an de, tevî tevgera rêxistina Komela Xoybûn dibe û dest bi kar-xebatê dike, ta navbera salên 1941-1943 an, gava bibû belavkirê belavokan li gelê herêma Kurdistanê, ta digihand qeza Mêrdînê û deşt û çiyayê wê, helbet van belavoka gel hişyar dikirin, ta ku çelxa Turkan aciz bû ji van tevgeran, ta carekê bi xwe cih li Seyda teng bû, da ku Cendîrme wî negirin, cilên jinan li xwe kir, da ku ji dest wan rizgar bibe, li bajarê Mêrdînê bi xwe.. ta dawîya rawestina Komela Xoybûnê û pişafîna wê , piştî hate girtin û yesaxkirin dema koçkirina Firinsayê û tewakirina dagerkeran ji xaka Sûriya ve .

Belê bi rastî ew salên ji 1937-1946 an, ji jiyana Seyda bi tevayî wêna xwe jê naskir û rîya paşeroja xwe jî girt, çi ew raman û hest ji hêla çandayî, an civakî û konevanî, an ew tekoşîna siyasî, ku bi kar û xebata gel û welat hate girêdan, ta dawîya jiyana xwe .. Wî jî kar-xebata xwe tev gelê xwe, bo welatê bindest û çar perçe kardikir, ku karibe tev rêxistin û sazîyên wê, milletê xwe ji zor û sîtema dijminan azad bike . Bi xwe wan raman û him jî wan bûyer û tevgeran, giyanê welatparêzî û him jî milletperwerî bi xurtî li cem Seydayê Tîrêj çêkir, ku ji bo berxwedan û xebatê bike, da li gor demê bin û ji vê yekê jî dest bi karê hêz û konevanî kir, gava tivî xebata Komela: Xoybûnê bûbû, bi dilekî soz û germ, ji wê çaxê de Seydayê Tîrêj temenê xwe tev de, xist xizmeta gelê xweyî bindest de. Lê îca tevî xam û pênûsa xwe û rist û helbestê xwe bi hest û ramanên pêça, û xwe avêt nav gel.. çi bi şeweyê helbestê ve, çi bi hêla çîrok û folklorê ve, ew daxwaz û doza yekîtiyê û berxwedanê dikir hertim , çi bi evîni û çi welatî bana, bi hestekî naz û durist dihûnand ewan hestên xwe .. da tohlilan hişyar û şîn be.

Ta bi xwe jî, Seydayê Tîrêj bû yek ê dudiwa ji mezintirînên toreya Kurd li Sûriyê, piştî helbestvanê mezin Cegerxwîn, bi şeweyekî resenî, wek çawa Cegerxwîn ew bersiva navdar bonî wî da .

Bi wî şeweyê nû li darket, çi çandayî, çi civakî, çi netewî .. Belê bê ku bête jibîrkirin cora evîni jî, çimkî helbestên Kurdî bê stranî nabe – belê mebesta min ne ku stran bi xwe – lê awaz û rim tede heye bê goman ji ber naverok, bi movik û rêz û bende , pir bi vî rengî li gasîne dibû, ji ramanê azadiyê û serxwebûnê, daxwazkirê yekîtiya gel û hevgerîna û xebata wî bû, bi rastî tevî ruhê helbest û toreya Kurdiyati bû, di jiyana wî de, ku bi bîr û baweriya karê rola konevanî dikir tevî xam û pênûsa çak bi tore û ristê ve.

* * *



Wekû tê zanîn, yekem helbest rist û nivîsî, ew jî di sala 1943 an de bû, gava ku xwest here Beyrûtê, cem Mîr Kamîran Bedrxan, perpiyarê govara Ronahî , Stêr û Roja Nû , nexasim govara Roja Nû .. Bi daxwaza hevalbendê Komela Xoybûnê .. Bi hevalê xwe re, Osê Hersan re, ew helbesta yekem nivîsbû bi navê: "Kerwanê Dewletan" bû .

Ji wê çaxê jî, têkelfî di navbera wan de çêbû, ku di wan govaran de dinivîsî û belav dikir, û herûher bihtir bi ziman û çanda Kurdî hate girêdan.

* * *

Belê.. Piştî herfandina Komela Xoybûn, Seydayê Tîrêj xuyaye bê tevger neditebitî, çimkî tevlî partîya: Koministê bibû, bi tevgera wê demê, tev hevalê xwe û serekê tevan Cegerxwîn, ta demekê ku di sala 1952 an de, di çaxa serokê Sûriya; Edîb Dîşekî de, hat girtin bi êş û sikince demekê ket zindanê, bi vê girtinê.. hin berhem an pirtûkek ji karê wî, talan kirin wan şovînyên wê demê, bêy ku zanibin çî talan û bindest dikan, tevî çend pirtûkên mitalî jî pêre, dûvre .. piştî Seyda ji zindanê Dêrîkeve, dide pey berhemên xwe, ku karibe vegehrîne, li vir û li wir, bi pirs û daxwaz, û alîkariya viya û wiya, ta carekê bi temînî çû cem perpiyarê (Em), yê ser destê wî hate girtin û talankirin, û çawa soz dayê ku jê re vegehrîne, lê mixabin ew soz neçû serî, çimkî ew kes mir û ew ta qetîya, û pêre berhemê pirtûkekê wînda bû, xuyaye -mixabin- ta bi ebed.

Lê ev ne tenê mebesta wî bû, ku dema partîya Kurda damezrandin, di sala 1957an de, têkelfî pêre bi xurtî danî, lê ne bi endamî, belê wek hevbendekî dilsoz.

* * *

Û wiha da em vegerin dîsan bi hev re jîyana Seydayê Tîrêj bişopînin.. Ji ber mercên aborî xwendina xwe kuta nake û vedigere, piştî kutabûna niv xwendinê, li Amûdê sala 1943 an hate gundê Girkeftar û lê bû Melle, çend salan ew û hin ji malbata wî .. Ji wir jî barkiriye, di sala 1957 an de, an bijêre û li gundê Ereba: Sekfan bûye nivîskar û Melleyê gund ..

Berpiyarê gund serekê Eşîra Cibûriya: Ebdilezîz El-Muslit bû, û li wî gundî jî li hirêma Hisîça bi tamamî, nêzîkî bîst û pênc salan didûmîne, û dawî jî wir xwe bar dike bi malbatî, diçe bajarê Hisîça, ew jî di sala 1971an, li taxa Ezîziyê, beşê Salihîyê li gundê Miftî bi cih û war dibe, û bi coşeke mezin di derbarê helbesta kilasîk de ji dil dişopandîne, ji ber pir gavin çak, di tor û wêjeya Kurd de avetîye, bibû dengekî pêwîst di resenîya helbesta Kurdî de , ne li Sûriyê tenê, bi bawerya min li tevaya Kurdistanê jî, belê piştî belavbûna helbestên wî bi stran û awaz bûn ser zimana.. û nexasim :

Ey bilbilê dil şadî hela were bike fîxan Dêrdê me pîre ey lo bira birîna me kûre..

Di wê salê de jî, wek me gotî bardike gundê Sekfan, nav êla Cibûriya, ta jî wir jî bardike bajarê Hisîça di sala 1971an de, ta tevlî rêza Partî dibe, li wir jî nûve .. pir pê xweş tê ku mîletê Kurd rabû berxwedanê .. û pir kêfa xwe anî bi Barzanî ku şoreşa başûrê Kurdistanê li darxist, bi rist û sirûdan pesnê şoreşê dida, tev şîn û şadîyên welatê xwe, çî cejnên Newroz an avdarê bana, çî navdar û pêşmerge û şehîd bana , û çî keç û jinên Kurd bana, tevayê azadî û serxwebûn û wekhevî bana.. hd .

Bi xwe Seydayê Tîrêj dilsozekî pakbû, bo doz û daxwaza gel û welat, ji ber tevî xama xwe di riya wê de bû, ji vê pêve nizanibû ,.. û dida xuyakirinê da

ku helbest û helbestvan serkêşê civaka xwe be, êş û azerê wî bi ziman bike û bide xuyakirinê, çî cejn û kêfên wî, serketin û serpêhatîyên wî xuya bike, jî ber eve rola rewşenbîr û nivîskarên .

Ev welatparêzî xuyaye di tevaya berhem û erkê pirtûkên wî de, pir bi şopemayên xwe ve dişopand jî tore û çanda Kurd, mîna ristên Mellayê Cizîrî û distana çak "Mem û zîn" ya mîrê helbesta Kurdî resen Ehmedê Xanî û nexasim mamoste û him jî hevalê riya wî Cegerxwîn, yê pir jê vedida û pir ketibû bin akama wî de, tevî bi xweşî helbestên kilasîkên Ereban yê giran dixwendin û pir caran jî

Mutenebî û Ebû Ela Elmîerî û Entera. Yanî navdarên Erabên Kilasîkên mezin, xwedanê Mueleqatên kevnar dikir.

Bi rastîya xwedê, Seydayê Tîrêj, destê wî sipî bû di alîkariya xortên nû hatî de, ku pir caran xweşgotin dida wan, bi hevîbû ku wê şûna wî, vala nemîne û her wê riya helbest û tore û çanda Kurdî bigihînin asteke berfirehtir û herdem digot di civînên xwe de: bixwîn in û binvîsîn in, çî nûjin û çî serbest be, yan kilasîk û rêzband be, çî bi zimanê Kurdî be, yan bi zimanê biyanî be, jî ber ku Seydayê Tîrêj bawermend bû, çimkî xortên ku bi vî karê şaristanî radibin Kurdin, wê bi xwe berhemên wan jî bi Kurdayetîya xwe diyar bikin, û wê têkevin xizmeta tore û çanda Kurd de, çî xort û mijûlên bi helbest û akama xam û pênuşê... Seydayê Tîrêj, dest li piştê dixist û pir caran pêşgotin jî berhem û pirtûkên wan re dinivîsan, dinivîsî bê dixsî, xwe li ser kesekî mezin nedikir, wekî pir tawûsan li nav me, çimkî ew didîtin şaxin ji dibistana xemilandî ..hd.

* * *

Berhemên Seydayê Tîrêj jî bi xwe, piraniya wan helbestin, heyanî nuha sê pirtûk dehênaye û çapkiriye ew jî evin:

1. (Xelat) di (1990)î de.. helbest, li Sivêdê hate çapkirin
2. (Zozan) di (1990)î de helbest , ew jî li Pàmê hatiye çapkirin bi pêşgotina D.Zengî .
3. (Cûdî) di (1998) an de, li bajarê Beyrût hate çapkirin

û ew jî bi pêşgotina D. Zengî.

(Serpêhatiyên Kurdan) di (1992) an de, ev pirtûk hemû kurteçîrok in, ji folklorê Kurda ye, li Pàmê hatiye çapkirin, û bi xwe jî ji weşanên govara Zanîna e û bi alîkariya berpiyarê wê Ebdulbaqî Huseynî ye, ji bajarê Qamişlo, di dawî de wekû tê zanîn, Mamoste: Tewfîqê Huseynî wergerand zimanê Erebi di sala (1996)an de .

* * *

Her wiha jî... Mixabin dawîya jîyanê - kêman zêde - zû tê, qeda bi dunyê Keve.. Seydayê Tîrêj çû ser dilovaniya xwe, piştî jiyanek tijî hezkirin û helbest, di xizmeta tore û çanda gelê Kurd de, di roja 23. 03. 2002an de li bajarê Hisîça ..

Can jî laş firiya, û bajarê tevî birîndar li dûv xwe hişt û çû ..

Lewra Seyda di dawîya demên xwe de pir bi qedir û hawa bû, ku Seydayê zîrek Tîrêj, sê caran hatî xelat kirin :

1- Xelata mehrecana helbesta Kurdî li Sûriyê ..1995 an.

2- Xelata - 100 - saliya rojnamegerîya Kurdî ..1998 an de.

3- Xelata koma Helebça, ya folklorê Kurdî li Cizîra Sûriyê .. sala 2001 an de.

تیریز : وهذه قصيدة من نظمي ألقيتها في أربعينية الشاعر

{şîna Seyda yê TÎRÊJ}

23-3-2002

Ezê çawa li xwe dînim îro

Bêjim Seyda wî ji nav me bar kir
Rast e bûyer: yasa xurist ber b'ro

Bes dabêjim Seyda yêm xwe parkir
Ne min kin-dirêj
Seydayêm TÎRÊJ

Seyda Tîrêj tucar namre li dila
Dema tarî rawest Tîrêj hila
B' tîpe-gotrî naz û pakî Kurdî
Navdarê hest û helbest got bila
Ziman wê ci bêje Seydayêm TÎRÊJ

Du bûyerin jîn û mirin d'bûrin
Bi hev re ne cêwî nav wan pirin
çawa di jîn dibîne tîn û derin
Yam b' dilê wî ku li dila namrin
ez nakim dirêj .. Seydayêm TÎRÊJ

L' jînê em dibin ermancên tîra
B navê Yazdan yek dike nîra
Tenê mehder eşq bo welat û gel
Dide mental ber dil naçe j'bîra
Ci - Abdal dibêje Seydayêm TÎRÊJ !

Rist xêz dimîn bi te sax dem çendî
Bi pirtûkên: Xelat . Zozan û Cudî
Ta ket rêza Cegerxwîn û Xanî
Her dimînin gotinên çak b' xwedî .
Hindekin ev rêz Seydayêm pakrêz.





Ji folklora kurdî

ŞÊR û GAYÊ ZER



Dibêjin carekê sê ga hebûn . Yek zer bû . Yek reş bû û yek spû bû . Hersê heval û hogirên hev bûn . Bi hev re şîr xwaribûn . Û di xweşî û firehiyê de mezin bûbûn . Û heyîya xwe dabûn hev . Û ketibûn nav qamîşekî asê de . Ji bo paraztina xwe ji dehan . Çend daran gurî û hirç û piling li wan derketin , çûn ko wan bikujin . Dîtin ko hersê hev re hevalbend in û xurt û zexm in û har û hêç in . Newêran xwe li wan bidin î biqewimînin . Tu rê ji bo kuştina wan nedîtin . Zivirîn çûn nik şêrekî . Û jêre qise kirin û gotin : Sê gahê wisan li filanderê de hene . Em çûn wan bixwin me newêra xwe li wan biqewimînin û me tu rê ji kuştina wan re nedît .

Şêr got: rê û elac li nik min û ez dizanim . Şêr çû sehiya wan kir , dît ko wisan e herwekî jê re hatiye gotin , newêre xwe rast rast li wan bide biqewimîne . Şêr rûnişt û melheza kuştina wan kir ka bi çî awayî tene xwarin . Rê dît û hêdî hêdî bi hendekî kiçik û çavên sist û nizim giha nik wan . Kêfxweşî li wan da û got: ma hûn nizanin ez çi ças ji we hiz dikim û heyransim . Ez hatime da em tev de Rabin û rûnin û bibin çar bira û hev re bijîn .

Hersê ga li hev şewirin û gotin: Em sê ne û ew yek bi tenê ye ew bi me nikare bila digel me be , û bi havaltiya wî qaîl bûn . Çend rojan vekre borandin û li hev ewle bûn û zanîn ko bûne dostên rast . Rojêkê şêr gayê spî û zer nependî kirin û pesnê wan da û got: Em hersê spî û zer in û nêzikî hev in û ji yek rayî ne .

Ma ev gayê reş û pîs digel me çî dîke û ne ji ra û xwîna me ye û zêde ye . Û hevaltîya wî ji me re nabe û em hersê bi kêrî xwe tên . Bûne yek û e reş kuştin . Şêr bi çûna reşo şa bû û çavên xwe bel kirin . Heftikî dî şêr zer nependî kir . Û jê re got: Ey dest bira ez dibînim tu ji spiyo gelek spehîtir û xurtir , zexmtir û eqiltir î rayê min û te dimîne hev . Ma em nikarin xwe biparêzin spiyo zehf dixwe û dixwe û çêre xelas kir . Lê em mane welê . Divê ew ji nav me derkeve da ko xweşî hemî li me bimîne . Sipyo jî kuştin . Piştî çend rojan . Nûka hiş û eqlê zero hatin serî û zanî ko havaltiya şêr ne ji dostanî û hezkirina wî ye jovan bû lê jovanî dest neket . Û bira hevalên wî hat bîrê û zanî vêca dora kuştina wî ye . Ji lewre zanî tenê nikare şêr . Û tu rê ji bo xelasiya xwe nedît ji destê şêr . Pê lingên xwe ax dikola û serê xwe dikir . Qorî û girî û hundirê wî şewitî . Şê lê nêrît û got: Erê birayê zero ma tu çira diqorî û digrî . Û axê serê xwe de dikî .

Zero got: Giriye min ji bê tifaqîya min û bêbextiya te , ne dostaniya te ye , roja ko reşo hat kuştin . Ez hatim kuştin û roja spiyo çû ez çûm . Ez dizanim îro Dora min e jî .

Şêr lê zivirî û pencêk lê da kulabên xwe gihand ser kezeba wî û got: Dostaniya min digel te û biran ev e zero .

*-Ji "Hawar Cild-1, hejmar 1-23, (1932-1933) , Nûdem, R 557. Yan jî Hawar hejmar 18.

Feqîr Ehmed

Navên Kurdî



NAVÊN keçan

Al, Ala, Alan, Anîk, Arî, Avrû, Azadî, Avê, Avbir, Avîn, Avşîn, Ardî, Arişt, Arlok, Avşîn, Agirî, Aşîti, Avzêmk, Avsark, Avdî, Avesta, Amed, Avsar, Avista, Arjîn, Arvan, Arşîn, Aran, Arpîn, Asê, Avrû, Awaz, Banî, Babir, Basîkê, Bidil, Bîstan, Bazin, Bêder, Bihîşt, Baran, Bedew, Berzîn, Bêmal, Berxê, Berbang, Berbû, Bawer, Badil, Bêje, Bênav, Bênaz, Bernaz, Binaz, Bêjîn, Bêxal, Bêrî, Bêrîvan, Bazê, Berf, Berfê, Betê, Berfîn, Binevş, Biniş, Bihar, Birêz, Bazê, Belûv, Bihîv, Bêzar, Besê, Berxê, Benik, Bendik, Berdêl, Cano, Canê, Carê, Ciwan, Cehwer, Cejnê, Cîran, Cihan, Cûdî, Cûdê, Cocê, Çopî, Çînê, Çavreş, Çavşîn, Ççek, Çolban, Elif, Enî, Ezma, Ezîn, Evîn, Erdêşêr, Erîvan, Êşxan, Êşbir, Fendo, Ferdê, Ferê, Fero, Fermê, Ferzend, Ferzende, Find, Firoş, Fero, Findê, Ferfûr, Fireng, Fîdo, Girav, Gulxan, Gul, Gulbihar, Gulok, Gulbîn, Gulistan, Gulpêrî, Gulban, Gulîsor, Gulîzer, Gulîzar, Gulcan, Gulçîn, Gulşa, Gulda, Gulbir, Gulan, Goz, Gozê, Gulnaz, Gijlok, Gehwer, Geş, Geşê, Germê, Giha, Gilan, Gulê, Gulfiroş, Gulok, Gurê, Gogê, Gulpê, Dîlan, Dilber, Dêrsim, Delal, Dême, Dep, Dê, Dilo, Dil, Dilê, Dilpak, Dilşa, Dilşah, Dayîk, Dilnaz, Dilfiroş, Dîlfiraz, Dilda, Devken, Dêrgul, Dêlgur, Dilgir, Dengîn, Dengê, Desmal, Deştê, Darçîn, Dilsoz, Doz, Dozê, Dîlovan, Dilgerm, Diljîn, Dindê, Dicle, Dîmen, Donê, Dûrdînk, Dûxan, Dûrbîn, Dîlok, Dîhok, Dildar, Dimsê, Dîwan, Havîn, Hawar, Hêvî, Hîv, Hîvê, Hêvan, Heval, Hevlêr, Hêlîn, Hêja, Hingiv, Hîro, Hedlê, Hindê, Helwest, Hêjîn, Hêjê, Hevnaz, Hevdî, Hevdîn, Holê, Hinar, Îşxan, Îsot, Îso, Îslim, Jîn, Jîyan, Jîndar, Jêz, Jêzê, Jîrê, Kurd, Kurdê, Kurdistan, Kulan, Kêzîban, Kezem, Kewser, Kumar, Kew, Kesbîr, Keskar, Keskir, Kewê, Kuzê, Kewkurk, Karê, Karîn, Qarût, Qaz, Qezîn, Qemerûk, Qitî, Qîbar, Qîvar, Qoqî, Qumrî, Mijda, Medya, Merza, Mêrgê, Mîne, Mîrzê, Miraz, Mîyase, Mînak, Mircan, Mîvan, Mîldan, Mûşê, Navxwoş, Navê, Nalîn, Navbîn, Nasê, Nêrîn, Nûbar, Newroz, Netew, Nûvîşk, Nûvîs, Nivîş, Nêkuk, Narîn, Nevîn, Nermê, Nêrgîz, Nahîde, Nazo, Nazê, Newal, Naylê, Nazdar, Noş, Noşîn, Noşê, Navdî, Nermîn, Lalîş, Lêmişt, Lorîn, Lezgîn, Lêvgez, Lêvşîr, Lêvjîn, Ocê, Ol, Olê, Oljîn, Olî, Olîn, Olan, Olpak, Olnaz, Olpîn, Payîz, Pêşmêrge, Perwîn, Pêwit, Pêwestê, Pênûs, Payîz, Perîn, Pêr, Rêdî,

Pêro, Pîroz, Pêşeng, Pêl, Pêlîn, Rêbir, Rêdî, Rêbaz, Reşan, Rûmet, Rûgeş, Robîn, Roj, Rojîn, Rûbar, Rûşen, Rûşên, Rojan, Rojda, Roj, Rengîn, Rewş, Rewşê, Reşîn, Rozê, Rozîn, Rabûn, Rindê, Rûken, Riha, Reşan, Rênas, Rêdîn, Ronî, Robîn, Ronê, Ronayî, Rotîn, Rodil, Rokir, Robir, Robir, Rûbîn, Roger, Sîdar, Sîfî, Serxirêman, Serfiraz, Sedef, Serdil, Sinbil, Serxwebûn, Sozdar, Soran, Sorcan, Sêwaz, Sêvê, Sorgul, Sarê, Sinbil, Sîs, Salhê, Şehîn, Şîrîn, Şîtlê, Şêrê, Şemê, Şîtil, Şilan, Şêngal, Şîrvan, Şîrvan, Şevîn, Şekir, Şevbir, Şîrbîn, Şelîn, Şermîn, Şîrnaz, Sîma, Şevîn, Tacîn, Tacê, Tenik, Tigris, Tevdîr, Tême Tilfan, Welat, Werdê, Weşan, Weso, Wanê, Weznê, Xezel, Xizem, Xoşnav, Xwenav, Xunav, Xenavî, Xibşê, Xilat, Xec, Xwaza, Xanzo, Xatûn, Xwabûr, Xwaza, Xilat, Xilxal, Xopan, Xuşaf, Xwînzî, Xoybûn, Yadiğar, Yaqût, Zegros, Zergo, Zexo, Zêdê, Zerî, Zîvîn, Zêrîn, Zîlan, Zela, Zîn, Zîno, Zindî, Zîz, Zirîf, Zîbêde, Zêrê, Zîvê, Zibo, Zindî, Zarav, Zîzê, Zûbîn, Zûrok, Zêrîn,

NAVÊN lawan

Al, Alan, Azad, Aram, Agir, Amed, Apo, Aşvan, Arbar, Arist, Arişt, Arpêt, Argir, Bilind, Bapor, Başîq, Badil, Bazo, Bandor, Baran, Bager, Babir, Bawer, Badîn, Bahoz, Bakur, Berhem, Başûr, Berkel, Berxwedan, Bestek, Beşîr, Beran, Bêlan, Berêz, Birûsk, Birêz, Bişkuk, Biro, Cindî, Casim, Cîran, Cemşîd, Cihan, Caro, Cejno, Çeto, Dilo, Dilşa, Dilşah, Dilpak, Deqnoz, Dicle, Dûrep, Dîyar, Dewrêş, Dêrsim, Dêmo, Deqo, Daran, Egîd, Enî, Erdeşêr, Etûn, Gara, Giha, Gernas, Gedûr, Giran, Gimgim, Govend, Guherz, Fadil, Fêde, Feqîr, Ferhat, Ferat, Ferdûn, Ferho, Ferhan, Ferzan, Fewzî, Xebat, Xilat, Xusrew, Xusro, Xêro, Xînis, Xidir, Hemêz, Hezar, Hemreş, Hudûd, Hîtan, Îsot, Jan, Jandost, Jîr, Jîrdilovan, Jankurd, Jano, Jorhat, Jîro, Jîn, Jînda, Jêhat, Kemend, Kêysor, Dêwbend, Kurdo, Kelhor, Kanî, Kardox, Kador, Keldox, Kelhor, Kelem, Key, Keyxusro, Qasimlo, Qasim, Qato, Qenco, Qîto, Qîr, Qîrkurd, Qeyto, Lalê, Lalîn, Lalo, Lolo, Lor, Lêmişt, Lezgîn, Lebat, Lêhat, Lêvsor, Lêvşîn, Lêbîn, Med, Mîr, Mîro, Mêro, Mîrkut, Mîrxas, Mîrger, Mîrkûn, Mîrkan, Mîrwar, Mîrban, Mîrşan, Mêrbar, Mîro, Mesto, Mendo, Mîrhem, Mîrza, Nezan, Navdar, Navdî, Nêrîn, Nêkuk, Nemir, Nêro, Ob, Oldî, Oldar, Olfir, Olnas, Olhêj, Olrêz, Omik, Peyman, Pêkhat, Pêşket, Pêhat, Pêkar, Pêkir, Pariz, Paku, Piling, Penco, Pêwîst, Pento, Pêkal, Pêxal, Peykel, Rîndo, Rizgar, Rîzer, Rîpo, Rîsor, Rengo, Rêzan, Rêdan, Rêdar, Rênas, Rêbaz, Rêncber, Rêzvan, Rustem, Robîn, Rodî, Reşo, Rêbaz, Rodîn, Sapan, Serbend, Sinbil, Serxap, Serbar, Sermêr, Serger, Serxwebûn, Sîpan, Serbend, Sêner, Serhat, Sertac, Serdar, Sekman, Sefkan, Sefo, Sîmo, Sîrac, Şaku, Şewat, Şîyar, Şêrgo, Şervan, Şerwan, Şemşît, Şengo, Şepal, Şeref, Şerger, Şervan, Şevket, Şero, Şaho, Şivan, Şemdin, Şêro, Şitlo, Şenêr, Tahîr, Têmur, Têmo, Tenîk, Welat, Yaqût, Yekta, Zerdûş, Zerdeşd, Zerdûşt, Zal, Zana, Zoro, Zarav, Zndî, Zêdan, Zîrek, Zinar, Zeydan, Zegros, Yêzdan, Yêzdanşêr, Yekta, Yekbûn, Yekbî.

Boniye Cegerxwîn



Civîna şevê

VA tême civînê î şev
Amadene hestê min tev
Ji pergîna min tu nerev

Ez daxwazê dîtinê me!

Meger li min bibî xwedî
Gazinekê nekî sedî
Tu yî kevoka mî kedî

Ez daxwazê civînê me!

Bi evîna te nûjînim
J' bilî te kesî nabînim
Bi te re, timî bi vînim

Ez daxwazê pergîne me

Dil û derûnê min sazin
ji te ew qet nakin gazin
Zanin Jin delal û nazin

Bendewarê civînê me

Ji bo te dilê min dîne
Hêz û rewa li min nîne
Bê te derûn tim bê vîne
Şadim, l' bende civînê me
Stochholm.08/09/2004

Pênûsa Mîna Îro

Serhan Isa

serhanisa@hotmail.com



Amûdê Hec û Qubleye

``kulmek peyvexwîn ji şête elbestvanekî kurd, li
ser gora pakrewanên Amûdê ``

Amûdê,
Ku yek ji bijwêntirîn axa Xwedê ye,
Di ciyografiya şûreşa azadiyê de,
Amûdê,
Ku yek ji şarzetirîn axa Xwedê ye,
Di afrandina ademzadan de,
Amûdê,
Ku bilindtirîn asîmana
Di bîra Rojava de,
Amûdê,
Ku bihêztirîn dengê Kurdî ye,
Di şûreşa azadiyê de,
Amûdê,
Ku bi xwe Hec û Qubelye,
Li wir,
Li wê Amûdayê îro,
Li wê hec û qubelyê îro,
Li cade û kolanên wê,
Li jêr û jorên wê,
Kurdên Sedsala Bîstûyekê,
Kurdên jirêketî,
Xwe fêrî mêranyê dîkin.
Li wir,
Mêrên xiloxavî
Yên ku ji sîka Amûdê dibizdiyan,
Lingên xwe yê şaroxî,
di kolanên Amûdê de,
Fêrî meşa mêranyê dîkin,
Milên xwe,
Yên ku,

Fêrî Roj baş, bi Kurdî nebûne,
Fêrî hilgirtina şekê dîkin,
Li wir,
Li Amûdê,
Soz şehîd dikevin
Mirovatyetî şehîd dikeve.
Amûdê, ku di neqşeya mêranyê de,
Kevintirîn dibistana
Amûdê, ku bi qîrêna keş û lawên wê,
Erşê Diktoran dihejand,
Amûda,
Ku qîz û xortên wê,
Geştirîn û bibêntirîn gul bûn,
di buhara şûreşa azadiyê de,
Îro ew Amûda
Di ceyografiya birînê de,
Dibe reştirîn dilop
Di enya kurdî de,
Û hêdî hêdî,
Xwe li devê birîna xw,
Ya xuro Kurdî de,
Dide hev,
Û dibêje:
Kurdno,
Şabaş ji Tifinga we re,
Şabaş ji biratiya we re,
Şabaş ji hezkirina we re,
Şabaş ji yekîtiya we re,
Şabaş ji şûreşa wer e.
Şabaş... şabaş

**Celal Muhemed Emîn
(Hozanê Dilzar)**



Laş bi fêrmêskan bişo

(Ev çî zindanin di çavên te de azadiyê belavdikin)

Şahgula mêrga dilê min
Xun di rûkên xo neçîn
Qerqera laşê me be po-
Rê te wer dil pê vejîn

Nû vejîn termê şikestî
Laş bi fêrmêskan bişo
Hem bi xwêdana ji axê
Geh bi lavan min biçîn

Şahgula mêrga dilê min
Bend û xelqên wî pirin
Min kilîft dabû firiştan
Lê bi dîtina te şikîn

EW bi dîtina te heriftin
Can ji te bû neynikek
Şahgula mêrga ji xwîne
Wer di dilde xwe bibîn
1996 hozan dilzar

YASEMÎN

Çav û dil kanî û ristin
Rengê xwîne Yasemîn
Wek gula j kevryan derîni
Tête dîne Yasemîn

Roj bo roj ez tême hiştin
Tev nerîne Yasemîn
Pir li min wer tê guhertin
Mîna jîne Yasemîn

Belkî ew davên du mahan
Bend û davên min vekin
Herdû çav torê kewa bin
Tor şerîne Yasemîn

**Beyar Robarî
Gul û dil**



Ez çî bêjim lê dayê
Ma çî bikim lê yadê
Gul standin lê nazdarê
Dilê min êşandin û bi tenê hîştim
Bê gulê, ez melûlim
Bi derdê wê, ez mijûlim
Ez ji wê, gelek dûrim
Jibo wê, di gî diborim
Dayê gul bûye derdê min
Dîtina wê mebesta min
Ez dixwazim wê bistînim an birevînim
Gul bi min pir şerîne
Kesk û sor û zer rengîne
Gula min gula buharê
Şên û ronî dide 21`î adarê
Xweziya dilê min havîn û zivistanê
Ez bijîma li Kurdistanê.

Tembûr

Tembûrê lê tembûrê
Bejin zirav perde hûrê
Naziya dara goz û tûyê
Xweş deng û mûzîk rûyê
Dengê zavan û bûkan
Şerîniya şelûl û çûkan
Awazên ciwan yên kew û kevokan
Axîna mirov û zarokan
Qîrîna bindest û hawara dayîkan
Tembûrê lê tembûrê
Têl zirav û perde hûrê
Diya gil û gaziyan
Dengê xizan û sêwiyan
Hestên evîndar û rêwiyan
Xemên koçberî û biyaniyan
Lorîna nexweş û jinebiyan
Tembûrê, rêya me dûre
Pêşî delave zor kûre
Xem û derdên ma tijî tûre
Tembûrê tu xweş tembûre
Şerîntirî, ji zurne û bilor û dahole
Ez û te, yek çem û çole
Çol û çema bê sînore
Distirên em, li dijî bindestî û dilên kore
Û ji koletiyê re gorê dikole

Ehmed mustefa



Evîna birîndar

Bes e dilo neke gazî
Me tu çî ji canê min dixwazî
Ev çand Salên tu birîndarî
Te ez kirime belengazî
Bes e dilo ey dilê birîndar
Bes e Te kir qêrîn û hawar
Careke tenê bibe dost û heval
Bes e Te canê min kir Agir û ez mam bê
Derman
Bes e Dilo ev Nalîn
Biner e Careke ev çî birîn
Dixwazim bibim dil evîn
Nexwazim bibînim êş û axîn

AX DILÊ MIN

Gava tu tê bîra min
Hêsir Ji çavan dibarin
Bîrya te dikim .. û.....
Bêhna te xweş tê min
Ax dilê min ax dayîka min
Te jê bîr nakim Heye xewşim
Li vê dunyayê te jê bîr nakim
Pirr bîrya te dikim
Gava tu tê bîra min
Dixwazim destan maç bikim
Di hembêza te de bimirim
Ax dilê min ax dayîka min
Ev Dunya bê te ne xweş e
Ev jîna bê te ne şerîn e
Dixwazim carake din te bibînim
Li ser çokên te serî dînim
Ax dilê min ax dayîka min

Tembûrê tu xweş buhare
Rengê gul û reyhane
Dengê xurtên xwandevane
Reqs û govend û dîlane
Ceng û xebat û şoreşvane
Lêdana te xem revîna jiyane .. jiyane.

Alan pîr mem

Ji kude.....??



Ji kude tu hat.....??!
 Ev hebûn û zanîn û çand
 Ev dîrok û ziman û nijad
 Ev xweşî.....buhar û qad
 Ev millet..Hebûna kevnar
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 EW gernasê...evîndarê zinar û lat
 EW xwendevanê...bi dem û kat
 EW milletê dîrokî...kevnarê rojhilat
 EW mîr û şah û şahînsah û seroxan
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Buhîsta bi wêne li erd û azîman
 Xweş û lav nizane bi te...gulîstan
 Nizane çîye ew hebûn ûnav
 Nizane tu li ser payan bûye taca ji lav
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Vegerim mîdya..Vegerim ekbatan
 Herim şaristan....herim landika kevnar
 Rûpelan....dîrok bîne bersîvan bide wan
 Erê min li ola zeradeşt dijminê ehrîman
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Silavan tînim ji guhderz û ferhad
 Silavan tînim ji perwer û xesrew û şah
 Herim ba kê...herim keleh û arvaz
 Masa bi zêr...xweşî..pîroz û şeh kas
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Ji êla lor û kelhor û mîtan
 Na...na...ji kurmanç û soran
 Na...na...ji mad û goş û kevnatorên salan
 Ji lolo...ji nayîrî...ji kardox û sobar
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Bersîvan min li nik teye kawayê hesinkar
 Li newroze....li ser xwîna....zehak
 Li şara minîgelek....gelek kevnar
 Li mîdiya....li vaşukan û...eylam
 Pirsyarim...pirsyarim welat

Ji kude tu hat.....??!
 Ji kûp û zinar û çiya û lat
 Ji berqefan....ji deryên rojhilat
 Ji yekem mirov li dem û cîhan
 Ji malbata yekem bi ol û êl û rêdar
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Ji şoreşa yekem li ser setemkar
 Ji têkoşîn...ji şer....ji kêferat
 Ji cenga yekem ser dijmin û neyar
 Ji tîr û şûr û pevçûn û....kevan
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??!
 Ji cenga gernas û siwar
 Ji yekem dilêr û....mêrxas
 Ji ser piştî karker û xebatkar
 Ji das û qîna a cotar
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat....??
 Ji ramanên evîndar û xwendevan
 Ji pênuş û pirtûk û....dibistan
 Ji felsefa milletan....felsefa niştîman
 Ji zûm û xurist û pîroz erd û qad
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??
 Kevnetor....kevnarê....kevnar
 Ji roja yekem ji dem û cîhan
 Ji bapîran....kal û pîr û bav
 Bersîvê bide....dîrok hê nezan
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??
 Şoreşa me...şoreşa mirov û insane
 Şoreşa ser ceng ser.....ehrîman

Bi can û ramanan û serbixwe rewan
 Ji olan re xwedî....kefen ûmal
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??
 Ez geryam li beşên dîroka kevnar
 KO ez bibînim yek navê wê Kurdistan
 Bi xeml û bîn û lav û ew....buhar
 Xweşika buhîsta li jor û jêr û azîman
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??
 Pirsya evista....pirsa Qur'an
 Pirsya vîda....pirsa ganc
 Pirsya zibûr...pirsa incîl û meta tewrat
 Pirsya pîroz....pirsa xweda û yezdan
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat.....??
 Ji şeva reş....elenda nûhat
 Ji gulstêrka aso û....asîman
 Ji dilê perîşanan....ji kul û Jan
 Ji derdan....ji bobelata kevnar
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat....??
 Landik û dergûşa mirov û insane
 Landika dîrok.....rênas û rêvan
 Dibêjin: şîr dayeşaristan
 Kurdistandayika çand û SAR
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat....??
 Bang ke...bi halan û hawar
 Bike li cîhan û mirovan talan
 Bi axiva pîr mijûl û raman
 Bi gotina ji dengê av û derya zelal
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 Ji kude tu hat....??
 Mehabad....mehabada jar
 Bi qaddî ...bi şervan û serdar
 Bi tiving û rexta berzan
 Bi kuştin û hewar û talan
 Pirsyarim...pirsyarim welat
 ji kude tu hat....??
 Kurdistanî pîr delal



Eger ez desthilatdar bibûyama
 Minê bi îsrar
 Kuştin
 Şer
 Zulm û zor
 Komkuji
 Ji hole rakirana,
 Ji bo ku xwîna mirovan nerije
 Minê dunyak azad ji nûva ava bikira
 Azadî
 Wekhevî
 Kubarî
 Hetevî
 Pêşkêşî mirovan bikira.

Eger ez desthilatdar bibûyama
 Minê her mirovîra
 Biratî
 Bavî
 Xudantî bikira
 Bibûyam xêrxwezê mirovan
 Kêrî wan bihatama
 Lê mixabin dunyak hovda
 Nav zulm zorêda
 Bi salane dinalim
 Dirizim
 Nayê xuya kirin
 Bê Cî WARIM
 Bê hemparim.
 Eger ez desthilatdar bibûyama
 Minê hemû jî bi cavekî mêze bikira
 Ji bo serfîrazîya mirovan
 Bibûyama mayak
 rênîş
 Qedera wan ronî bikira
 Aştîyê
 edaletê
 Hertim hukm bikira
 Cîneyet û tawanbar yê tunebûyana
 Hemû mirov bi hevra yê
 Wek xûşk û birabûyana
 Mirovê bi hevra yê teyax bibûyana.
 Eger ez desthilatdar bibûyama

BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ



**EGER EZ DEST
 HILATDAR BIBÛYAMA**

Xerabîyêra
 Îxanetêra
 Derewyêra
 Minê rê neda
 Mirovên şarezara minê
 Rê û derfet vekirana
 Minê rûçkê xaîna
 Bedkara
 Vaîskara
 biqilanda .
 Eger ez desthilatdar bibûyama
 Mirov hemû aştîyêda yê bijîyana
 Minê dîroka mirovahîyê
 Ji nûva dest pêkîra binîvsîya
 Minê hemû sînorên li nava mirovan
 rakirana.

Eger ez desthilatdar bibûyama
 Ev dunya minê bikira
W E L A T Ê M I R O V A H Î Y Ê
 Ji bo ku hevdu hesbikin
 Minê mirov ji nûva perwerde bikirana
 Minê dastana wekhevîyê û evînê
 Li ser rastîyê binîvsanda .

Eger ez desthilatdar bibûyama
 Minê ala mirovahîyê
 A biratîyê
 Bê rengê sor bixemlanda
 Dunya mala hemûyane
 Minê îlan bikira
 Ji bo ku mirov dijî hevdu ranewestin
 Minê pirtûka wekhevîyê mor bikira
 Hemû astengî ji holê rakirana
 Ji bo ku mirov hevdu nekin kole

Minê zakonên nû binîvsanda
 Zulm û zor ji holê rakira....

Eger ez desthilatdar bibûyama
 Dunya yê bibûya dunya wekhevîyê
 Kî n û qalêra yê rê nema
 Evîn ê ser biketa
 Mafê mirovahîyê ji nûva mine
MOR BIKIRA
EGER EZ DESTHILATDAR BIBÛYAMA
EGER EZ
 DESTHILATDAR
 BIBÛYAMA.....
EV DUNYA JI NÛVA
 MINÊ AVA
BIKIRA
DUNYA YÊ BIBÛYA
MALA
M I R O V A H Î Y Ê.....
 21.01.2013.

REWŞA JÎYANÊ

Bîna xwînê tê
 Ji dîroka mirovahîyê
 Dîdema zulm-zorê
 Derewan
 Dadigire cîhanê .
 Xemsaîya mirovan dixitmîne jîyanê
 Lê ji bo edaletê
 Hertim
 Mêrxas dikin ceng li meydanê
ÇARESER Û PAQIJ DIKIN
 Rênîşa cîhanê
 Rewşa jîyanê.....
 **** *** ***
 Hevdu înkare Kirin cînayete
 Bûye edetê mirovahîyê
 A bê menewîyyet.
 Mirovên bi sîyanet
 Têncandin
 Li pêş alemê
 Lê edalet bi peretî
 Tê kirîn firotanê
 Li cîhanê.....
 19.IV.2013.

Sernivîser
Qado Şêrîn
Rêvebirê Nivîsînê
Arşek Paravî
Desteya birêvebir
Abdilbaqî Huseynî
Ezîz Xemcivîn
Lawîn Şêxo
Pîr Rustem
Silêman Azer
Derhener
Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com



F
R
E
E
D
O
M

 F
R
E
E
D
O
M

 F
R
E
E
D
O
M



Freedom
 For
**HUSEIN
 ISO**



Freedom
 For
**CEGERXWÎN
 MELE
 EHMED**

A
Z
A
D
Î

 A
Z
A
D
Î

 A
Z
A
D
Î